

Sal:1 Hejmar:28 30 Tebax-5 İlon 1992 5000TL(KDVD) Rojnameya Hefteyi

Öcalan dibêje:

'Em qetlîama
Şirnexê bê
bersiv nahêlin'

Rûpel 16



Em di welatê xwe de kocber in

Kurd, dîsa di welatê xwe de, li ser riya koçberiyê (sîrgûn) ne. Di dîroka dînyayê de, tu mîlet mîna Kurdan, li ser axa xwe ewqas mihacîrî nekişandiye.

Di vê koçberiyê de teslîmiyet nîn e. Ew, bi vê tevgerê, protestoyek li dar dixin. Niha di qûntara Cûdî de ne û ji çiyayêne Kurdistanê pêstir, ji xwe re tu war nas nakin.

Rûpel 8



**Li Bosna
Hersekê
çi dibe?**

Faik Bulut


Rûpel 4



**Tevgera
Xoybûnê**

Kamîran
Haco

Rûpel 12



**'GAP'
an gep**

Servan

Rûpel 6

REWS



Abdullah Keskin

Gundî û "ronakbîr"

GUNDÎ Û ÇELEKA Wî

Li gundekî Kurdistanê, gundiye k çeleka xwe (hemû malê wî çeleka wî ye) difroşê û keleşkofekê dikire. Keleşkofê bi milê xwe vedike û dibêje: "Bi şeref ku Apo jî, dev ji doza (dawa) Kurdistanê berde, ez hew berdidim."

Ev bûyer iro li Kurdistanê wek pêke-nokekê, di civatan de tê gotin. Henek be, rast be, du rastiyen nîşan dide ev bûyer:

1. Gelê Kurdistanê bi dil û can li doza Kurdistanê, li Kurdiya xwe xwedî derdi keve.

2. PKK û gel bûne yek. "Gel PKK ye, PKK gel e." Ev hevok (cumle) êdî ne tenê sloganek e. Rastiya Kurdistanê tîne ziman. Di jiyanâ civaka me de, ji her alî ve ev rastî xuya dibe.

Gelo kijan faktoran ev guhertin çêkirin, an jî di bingeha van guhertinan de kijan faktor hene? Ci fikir û hêz e, ku bi gundiye kurd ê feqîr, çeleka wî dide firotin, dike keleşkof û bi milê wî vedike?

girtiye. Gelê Kurd xwe nas kiriye, ji bo doza Kurdistanê seferber bûye. Tiştekî ku winda bike jî nîn e.

Gotinê di straneke Hozan Sefqan de hatine cih. "Bûka delal bûka me, bûka Kurdistan, destê xwe dide çiyan dide tiving û rextan, destê xwe nadî dijiminan"

Ew ên ku dixwazin "PKK û gel ji hevûdu vejetînîn" berî herkesî û her tişti divê vê rastiyen bibînin. PKK û gel wek goşt û hestî bi hev re ne.

**Gelo kijan faktoran ev
guhertin çêkirin, an jî di
bingeha van guhertinan
de kijan faktor hene? Ci
fikir û hêz e, ku bi
gundiye kurd ê feqîr,
çeleka wî pê dide firotin,
dike keleşkof û bi milê wî
vedike?**

Jİ KOÇBERİYÊ RE NA!

Murathan Mungan di şîreke xwe de dibêjê:

"Hey dîrok
Hey zeman
Kî kî
Jî welatê kî koçber dike
Ü kî kî
Qebûlî welatê kî dike."

Dema koçberiyê xelas bû. Koçberî ne qedera me ye. Kevir li ser kevir nemîne jî, Kurdistan nayê berdan. Bajar nebin, çiya hene. Jîxwe gelê Kurd jî, xwe dispêre çiyayen Kurdistanê

MEHMET ALTAN Û

"CUMHURİYETA DUYEMİN"

Ev demeke dirêj e, ez nivîsên Mehmet Altan, ên di rojnameya Sabah de dixwînim. Wek tê zanîn, Altan teorisyenê "Cümhûriyeta duyemîn" e. Gelek caran li ser kontrgerîla disekeñî û di-got, bingeha vê dewletê kontrgerîla ye, divê xwe biguherîne.

Piştî çû Şîrnexê, ne em tenê, lê ge-lek Xwendevanen xwe şaşkîrin. Ne bi xelkê re, bi serleskeren "Cümhûriyeta yekemîn" re wêne kişand. Wextê ku gazî serleskeren dikir digot: "Paşam." Qatil û megalomanyak paşayê Mehmet Altan in. Di pîrsen xwe de, li qelema xwe îxanet kir. Li hemberê serleskeren geleki sertewandî bû.

Wilo xuya dike; bê çawa me Kurdan ji "cümhûriyata yekemîn" xêr nedît, em ji ya "duyemîn" jî, tu xêrê nabînin.

ERDAL İNÖNÜ "WEZİRË KARÊ PÎS"

Erdal İnönü, bi wekîltiya Demirel serxeş bûye. Ertugrul Özkök dibêje: "SHP ji behra (paya) xwe ya koalisyonê pê ve tiştekî nabîne." İnönü bûye pîne (riqa) ji Demirel re. Lî berdêla wê heye.

Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan vê berdêlê wiha nîşan dide: "Daxuyaniya karê hikûmetê yên çepel (pîs), di bin mesûliyeta Erdal İnönü de ye. Navê Erdal, ji vir û pê ve "wezîrê karê çepel, kare pîs" e. Ev nav li bejna wî tê. Ci karekî vê hikûmetê yê pîs û çepel heye, parastina wan peywira (wezifa) Erdal İnönü ye. Ne wilo bûna, bi 60 parlamenteri dibû şîrikê koalisyonê?

FERHENGOK

Amûjgeh: Enstitü

Awarte: İstisna

Berbiçav: (somut)

Berçile: Çileyê pêşî (Aralık)
Bobelat: Teşqele (kaza, bela)

Bi carekê: Bi temamî, yek-car (kesinlikle)

Delav: Körfez

Dilbestî: Eleqe (ilgi)

Êrîşkar: (saldırgan)

Hemberî: Pêşbirik (yarışma)

Helwestkar: (duyarlı)

Hevgirtî: (tutarlı)

Karsaz: Patron (iş sahibi)

Kiryar: Karvanî, pratik

(uygulama)

Kosp: Astengî (engel)

Navendî: Merkezi

Nirxandin: (değerlendirmek)

Sersar: (duyarsız)

Sersarı: (duyarsızlık)

Şop û delav: Rê, derfet (imkan, yol)

Şop: Dem, wext (an, zaman, mühlet)

Şop: Rêç, dews (iz)

Şahiz: (dalkavuk)


Şopgeren: Rêçbir (izci, iz sürücü)

Şopgeren: Rêçbirin (iz sürmek, izcilik etmek)

Şophiştin: Rêçhiştin (iz bırakmak)

Tatel: Saw (endişe)

Têğin: (term, kavram)



Ma hemû Kurd komunîst in?

Na, Kurd hemû ne komunîst in. Vê rastiyê gel jî, alem jî dizane. Gelo min bi vî awayî dest bi nîsa xwe kir, dilê we ji min ma, an nema ez nizanim. Divê dilê we ji min nemîne. Ji, roja rojnameya Welat derketiye heta iro, ez her heftê dikirrim û dixwînim.

Zimanê Welat bi kurdî ye, ez jî pîr kîfxweş im. Lî naveroka Welat komûnîsti ye. Ez vê yekê meraq dikim. Welat ji bo azadî û serxwebûna Kurdan an jî, ji bo navê Komunîstiyê tê weşandin?

Welat rastiya Kurdistanê di nav rûpêlîn xwe de diweşîne. Ü gel û alemê bi van rastiyen ronî dike. Çima rastiya misilmantîya gelê xwe vedîşere. Çima, kenê dijmin bi me tîne. Roja ku ez Welat distînim heval "ka em bala xwe bidîne ci dinivîse? "dibêjin. Piştî ku dixwînin ji min re dibêjin "sed hey?" çima bibêjin "sed hey?" çima bibêjin "ew Komûnist in çima bibêjin "ew ate-ist in."

Ez dizanim bi van xwestinê min Welat ne naveroka xwe di-guhêre û ne jî dijmin dibêje "a-ferîn." Evana ji bo azadiya we-lât xwe ruh û canê xwe feda di-

kin. Hûnê bêjin hevalen xwe biguhêrîne, ezê çawa biguhêrînim. Hinek ji wan cîran in, hinek ji wan jî hevalen mizgeft (camî) ê ne.

Nîvîskar û kedkarên delal, Welat bi ci awahî nîvîsan diweşîne bila biweşîne, disa ezê her tim welat bikirrim û bixwînim. Di van mehîn nêzîk de rojnameyek bi navê "Azadî" derket. Min wê kirî û xwendî. Lî "Azadî" tamû lezeta Welat ne da min.

Welat ji bo azadiye tê weşandin. Hûn nenêrin ku ez dibêjim ji bo komunîstiyê tê weşandin. Dilê me bi we re ye. Xwedê riya gelê Kurd û nîvîskarê Kurd fireh bike.

İro roja yekîtiye ye. Kurdistan ji wê bi yekîtiye bê avakirin. Gerke em komunîstiyê û netewe-tiyê bidin alîkî. Divê armansa gelê Kurd ji bo azadiye be. Gava Kurdistana azad, hat ser rûye cîhanê wê demê mirovê Kurdistanê di nav çarçoveya demokrasiye de dikare daxwazîye xwe bi lîv bike. Dijmin dixwaze me ji hevdû biqetîne. Ji me re dibêjin "Hûn misilmanen xalis in, hûn çima ji PKK û re nabêjin terorist

û hûn çîma nabêjin komunîst."

Em dizanîn ku riya azadiye di nav tetikên çekên PKK'ê de derbas dibe. Emê çîma bibêjin PKK terorist e. Xwedê hemû mirovan bi awayek azad afirandîye. Tu firqiye nexistiye nav mirovan. Xwede hebûnek azad e, bi ser xwe ye, ne girêdayî ye. Ne li cîhekê li her cihi ye.

Xwedê navê azadiye ye. PKK ji bo azadbûna Kurdan dipeyive. Madem PKK ji bo azadiye ye. Wisa be PKK di riya Xwedê de ye.

Kedkar û nîvîskarên hêja. Ez di bibistanek Erdîş de mamos-tatiye dikim. Heta iro jî kîfa min ji komunîstiyê re nehatiye. Lî Kurd im. Ji bo azadiya Kurdistanê can û ruhê (giyana) xwe feda dikim. Kî ji bo Kurdistanê bipeyive ez hevalê wî me. Bila komunîst be, bila putperest be bila mecûsi be, bila ézdi be.

Lî ku misilman be hin bêtirê xweş be. Kurdistan avis e. Van rojan wê dergûşek bîne ser rûye cîhanê. Nav wê dergûşê ji "Azad" e. Ev azad serfirazbûna gelê Kurd e. Azadbûna mafê hemû mirovan e.

Xwedê azadiye para me ji bîke. Înşallah

Mêrxas Ercis

Dewlet û rojnamevan

Bi eyyanî û eşkereti, rojnamevanê Kovara Özgür Halk'ê Çetin Abayay bi destê hêzên dewleta dagîrker a faşist ya Tirk ve hate qirkirin, li ser qirkirina rojnamevan Çetin Abayay, em naletê li dewleta mêtîngehkar a Tirk dibaşının Şehîden me bê mirin in...

Rojnamevan Çetin, li ser

Gelê Kurd Şirnexê bi tenê nahêle

Li ser qetliama Şirnexê gelê Kurd ne tenê li Kurdistanê, herwiha li hemû cihênu lê dijî helwesta xwe bi livbaziyan celeb bi celeb dide nîşan

(NAVENDA NÜÇEYAN)

Li ser qetliama Şirnexê, li çar medorê Kurdistanê û li hemû cihênu lê dijîn, protestoyen girseyî pêk têne. weke tê zanîn PKK li ser vê qirkirinê, ji bo 3 rojan şin ilan kiri bû. Li Diyarbekir û navçeyen wê, Farqîn, Bismil, Pasûr (Kulp), Piran (Dicle) û Hêne (Hanî) esnafan dikanen xwe girtin û errebeyen navbajaran nexebitîn. Li Diyarbekir û navçeyen wê gelek meş û erîş jî li dar ketin. Li Diyarbekir çend banka bi molotofen militanan şewitîn. Li Agirî jî, besdarênen protestoyan hatin binçavkirin. Li navçeyen Agirî, Bazid (Doğu beyazit) û Diadin jî, esnafan dikanen xwe girtin. Li sertê û navçeyen wê Misirê e (Kurtalan) Dihok (Eruh), Hezo (Kozluk), perwari û

Hawêlê (Baykanê), li Mûş û navçeyen wê Melazgir, Warto û Kopê (Bulanîx) li Bedlis û navçeyen wê Norşin (Güroy mak) û Tûxê (Tetwanê), li Hekarî û navçeyen wê (Şemdinan) Navşan, (Çukurca) û Geverê (Yüksekovalı), li Mêrdîn û navçeyen wê Nisêbin, Kosar (Qiziltepe), Dêrik û Kerboran (Dargeçit)



û li Batmanê esnafan dikanen xwe girtin şoferan jî erekbeyen xwe nexebitandin.

Otobosên wan û Hekarî jî derneketin seferê. Weki din, li bajarêne Turkiyê, yên ku Kurd lê dijîn jî, meş û protestoyen girseyî li dar ketin. Li Edenê Izmirê, Manisayê û navçeya wê Salihli jî esnafen Kurd dikanen xwe girtin. Dikan girtina esnafen Kurd ên Edenê 3 roj domand.

Li gelek bajarâne jî grevên birçibûnê li dar ketin. Li navçeya Diyarbekir Erxenî, ev cara yekemin e ku esnaf dikanen xwe digirin. Li Ewrûpa û li hemû dînayê, Kurd bi yek dengekî dewleta Tirk protesto dikan. Li gelek bajarâne Ewrûpa, avahiyêne dewleta Tirk ji aliye Kurdêne dilsoz ve hatin texrip kirin.

Avahiya wezîren Koma Ewrûpa jî nêzîkî saetek hate işxalkirin.

Li Almanya, bajarê Hamburgê jî, esnafen Kurd dikanen xwe girtin.

Weke tê dîtan gelê Kurd, li hemû cihênu lê dijîn, piştgiruya xwe ji gelê Şirnexe re nîşan dide û bi her celebê têkoşinê ji wan re dibe destek.

Banga YDK

Yekîtiya Dîndarêne Kurdistan bi belavokekê qetliama Şirnexê protesto kir. Di belavoka xwe de bi kurtî wiha dibêje: "Îro li Kurdistanê imperializm, li rojhilata navîn, bi destê hevkarêne xwe, Turkiyê û Îsrail hemû mafêne gelê bindest û misilmanan ihlal dikan û dikan bin piyêne xwe. Li hember van kirinê imperializmê dewlet û rêxistinê ji xwe re dibêjin em misilman in tu tiştek nakin.

Misilmanen ku vê hedisa Hazretî Muhammed zanîn divê li ber zilmê serî rakan: "Meyla xwe nedîn ser zaliman û alîkariya wan nekin. Nexwe, dê agir we bişewitîne û cihê we, wê cehnem be."

Tîm: 'Dor a Nisêbinê ye'

Piştî qetliama Şirnexê, li Nisêbinê, polis û tîm, ji xelkê ku digirin re dibêjin: "Dora Nisêbinê ye, emê vê derê jî bi serê we de, hilweşinîn, dê Nisêbin bibe goristana we." Xuya ye dewlet, bi Şirnexê têr nebûye.

Li hemû derêne ku gel dildariya têkoşîne dike û tirsa sedan salan cirandiye, dewlet amedekariya qirkiran dike. Nisêbin jî, yek jî wan bajarâne, ku bi yek dengekî piştgiruya têkoşîne dike. Ji ber vî ye ku dewlet, vî bajarê şerîn, ji xwe re hedef bijariye.

HAWAR

Dilbixwîn

Hawara azadiyê!

Ev ci dinya ye!

Cîhaneke fit û fireh, bê hejmar mirov tê de û li ser rûyê vê gerdûnê jiyan dîbin. Lî... Jiyaneke bi derewan, ku tu caran cih û şûna mirinê danagire.

Ev ci dinya ye!

Cîhaneke bê dodgeh, bê dilovanî, bê mirovahîya ku di demekê de hinek kes bir ser de digriyan û berhembez dikirin. Bi rastî şûna hakim û adilan vala maye. Her kes li gora tûjbûna şûre di dest wî de lêdide, dikuje û bindestan di bin potînên xwe yên ku ji Nîromê Roma hinbûne, diperçiqinîn.. Û guh nadîn hawar, rîxan û qêrina wan. Belê, eger mirovîkî tenê di cîhanê de mirovhez û maferwer hebûya, bê guman rewşa me Kurdan ne ev bû, lê çerxa dinyayê çewt dizivire.

Ev ci dinya ye!

Guh nade biryaren navneteweyî yên ku hemû we laten cîhanê îmze kirine.

Mixabin, Yekîtiya Navneteweyan jî kîndîra Sîste ma Cihanê ya Nû xistiye histûyê xwe û li pey tê kişandin. Bi wê kişandin re, birîna gelên bindest kûr dibe, jan giran dibe û hey wax li min û rewşa van bindestan, ku kesek nemaye xwedî li wan derkeve.

Mirov şêt û mêt dimîne, diheyire. Gelo, ji bo ci qêrîna me naçe guhêne mirovahîye, eger mabe? Ji bo ci ser canbaziya Meymûnekî Japonî rûpeleke dagirtî digel wêneyen wî dînîvisin û hawara 30 mîlyon insan davêjîne paş guhêne xwe? Ma ne mafê me ye em heya ku ji me tê nîfrînan li vê dînyayê bînîn? Belê em dîkarin, kes nikare bibêje me, çîma hûn wusa dikan; na! Ma ne bes e, ev çend sedsal in ku li ser pişta me, xwe li ser serê me kîrin paşa û mîr..

Di 70'an de em çend kes bûn. Çavêne me girtî bû, guhêne me kerr bûn, pişta me xûz bû, em lal bûn... Û me nedîzanî Kemalîzmê heya kîjan derecîye em xistîne bin bandorî û hîkariya xwe, me nedîzanî ji bo ci em Tirk in, Ereb in.. Faris in, em di dînyayeke din de bûn. Wêneyen Kemal Efendî dîwarêne me dixemilandin, me li hember kulehê wî sed carî xwe xwar dikan.. Bi vî awayî me rojêne mirinê di ser xwe re derbas kîrin.

Lê hema niha, weke dewletekê em hereket dikan. Ji dewletekê bêhtir xebata me bi sistematîkî tê birêvebirin. Bi bangekê re, bi mîlyonan kes radîbin serhîdanê. Û cîhanê wiha ku derewan zora xwe daye ser rastîan di bin xwe dihejînin. Lê çavêne cîhanê kor bûne, nabîne, naxwaze bibîne.

Tevî vê neheqîya dînyayê jî, wê di dilê wê de bibe hesret ku em biçin desten xwe li ber vegirin û parseyê bikin. Ev e temenê me derbasî 15 salan dibe. Me rojekê tenê jî pars nekir, me tu caran ji kesekî re negot: Aman, em birçî bûn, me ji zikmakî ve hûn ji xwe re bav hilbijartîne, tenê xwarînê bidin me..! Ji lewre hawara me ne ya Bergerê ye, ne hawara parsê ye û ne jî ya destramûsandînî ye. Bila ji hemû kesan re were eşkere û zelal kîrin ku, hawara me hawara azadî û serxwebûnê ye, hawara serhîdana neteweyî ye, hawara roja rûmetê ye!

Li Bosna-Hersekê ci dibe?

Faik Bulut

'Sistema Sosyalist' a li Ewrûpaya Rojhilat pelîşî. Bi rastî, ev sistem; navê wê sosyalist e lê ew bi xwe kapitalist (sermayedar) bû, ji ber vê yekê pelîşî. Hem ji aliye teorîk, hem jî, ji aliye pratîk (karvanî) ve sistemeke çewt bû. Piştî pelîşîna vê sistema Ewrûpaya Rojhilat, pelîşîna Federasyona Komarêن Yu-goslavyayê jî dest pê kir. Denguya biratî, wekhevî û dostaniyê xera bû. Bi vê yekê re qezenga ku Sosyalizm dabû gelan jî, ji holê rabû. Şovenîzma neteweya serdest dest pê kir. Di dawiyê de mafî tayîkirina çarenûsiya gelan jî, ji holê winda bû.

Ji ber pêkneanîna afîrînîna mirov û çanda Sosyalist, ew sistema xweşik a ku jê re dibêjin sosyalizm, hil-weişa.

Çand, xwedî du rist (rol) ên bingehîn e. Rola yeke-mîn, nasnamaya kesanetiyê;

ev rol ji xwenaskirina mirovan dest pê dike ta xwe nas-kirina ge'an pêl dide, rola duyemîn jî, navneteweyî bûna çandê ye. Di vê giha-

neteweyan. Vê çandê nas-na-

nekê d e çand ji sînorêneteweyî derbas di-be û ber bi civakeke bê çîn ve dibe internasional.

Di vê civaka bîhişt (cenet), ya bê çîn de neteweperestî tu-ne. Dijberî û têkoşinên neteweyî êdî li paş dimînîn û pêşeroja hêvîdar a mîrova-hiyê dest pê dike.

Çanda li Ewrûpaya Rojhilat û Yugoslavya, bû se-demê xwenaskirina gelan û

m e y a neteweyan bi pêş ve bir. Bes, ev çand di nav sînorêneteweyî de ma û mirovîn sosyalist nehatin afîrandin.

Bingeha Yugoslavya ji xwe kapitalist bû, sergeha wê jî, ji ber dîttintengiya neteweperestiyê bi pêş neket. Di pratîkê de îdeolojiya Sir-pân di çerxa dewlet û hikû-metê de bû serdest.

Yugoslavya, demeke dirêj di kesanetiya Jozef Broz Tîto de yekîtiya xwe parast. Lî piştî mirina Tîto yekîtiya Yugoslavya ya siyasi û dîrokî ji holê rabû. Bi kiryarê kapitalist û pîjkirina im-pîrîalîzmê nakokiyê neteweyî zêde bûn.

Piştî hilweşîna Ewrûpaya Rojhilat, dewletên im-pîrîalîst ên Rojava pozê xwe xis-tin nav Yugoslav-yayê.

Tiştê ku bala me dikşîne ew e ku li Yugoslavya her civakeke et-nîk pestekê milî li ser mînor-tiyê (hindikajiyê) di nav xwe de bi kar anî.

Li Yugoslavya û li Yekîtiya Sovyetê em hînî vê dersê bûn. Heta mirovîn sosyalist neyîn afîrandin û çanda sosyalist bi gelan neyê ecîban-din, tevílîhevîkirina gelan û linavhevîxistina civatên etnîk, di krîzeke herî piçûk de di-be sedemê lihevketin û na-kokiyê neteweyî.

Her çiqas Yugoslavya wek Iraq û Tirkîyeyê, çavê wê ne li bidestxistina welatên din

be û ne dagirker be jî, li ser gelê dinav sînoren xwe de pest û zordariyê pêk dihanî.

Ji bo ku komarên di nav Yugoslavyayê de belav ne-bin, Sîrbîn serdest, zîlm û zordariyê pîr dijwar li wan gelê din dikirin.

Almanyaya ku jî xwe re li pazarên nû digere û jî bo vê armanca xwe, pêşî dix-wazê nîjada Cermenan li dora xwe kom bike, bû se-bebê cenga hundirîn a Yu-goslavyayê.

Ji bo vê armanca xwe ya im-pîrîalîst, Almanya piştgi-riya Hirvatan kir û bû se-bebê deshpêkirina cengê.

Ji ber vê yekê, Sîrbistan li dij siyaseta Almanya ya "parçê bike û idare bike" ra-bû.

Fransaya ku bi Almanyayê re di hemberiyê de ye, ji ber girêdanen xwe yê dîrokî dixwaze alîkariya Sirpan bike. Ingilistan jî êdî siya-seten Amerîkî zehf dimeşîne.

Vêca helwesta Amerîka ci ye? Bi rastî, Amerîka hem alîgir hem jî nealîgirê mudaxelê ye.


Ku mudaxele bike, wê hêza xwe ya leşkerî, ji Ewrûpa re bide îspat kirin. Ewrûpa, jî di warê leşkerî de dibêje "Ez jî heme" Amerîka naxwaze bikeve şer û toyê şer bi Ewrûpa bide xwarin. Li aliye din, İsrâila ku bi hikûmeta Sîrbistanê re di têkiliyê xurt de ye û milîşen Sirpan perwerde dike, ji Amerîka dixwaze ku nekeve şer. Ji ber van nako-kiyan Amerîka jî mudaxele nake.

Tirkîye jî dixwaze bi ka-nala Makedonya û Bosna Hersekê ve hêza xwe xurt bike. Li hember kê? Hem li hember Amerîka û Ewrûpa hem jî li hember dewletên İslami. Piştgîriya Arabistan, İran û hemû dewletên İslamî ji bo Bosna-Hersekê tiş-tekî balkêş e.

Bulgaristan jî, belavbûna Yugoslavya û İlankirina Serxwebûna Makedonyayê wek fîrsendekê dinirxîne û li pey siyaseteke çavlîder (ya-yîlmacı) e.

Bi vê mebestê, du kam-pên nû xwe didin diyarkirin. Kampa Tirkîyê, Bulgaristan, Albaniya, Makedonya, kampa Romanya, Sîrbistan û Yewnanistan.

GOTİN



Yaşar Kaya

Şîrnex şewitî

Di dîroka Kurdistanê de gelek serhil-dan hene. Lî belê dewleta Romî, ber ku serhildan li dar kevin, bi dek û dolaban serhildanen pîlîşandine û gelek qîrkîrinan pêk anîne. Qetîlîma Şîrnexê jî, yek ji wan qîrkîrinan e. 70 sal e kîjan hîkûmet hatibe serî, bi tîrs û xof, bi kuştin û qîrkîrinan, xwestîne Kurdan di bin destê xwe de bigirin, wan bikin kole. Kî serî hîldabe, an kuştine an jî, ji welatê wî dûr kirine, rojekî negotîne, ku em mafîn Kurdan bidin. Di dinê de, tu dewlet, tu hîkûmet, heta dawiyê gelê xwe bindest nake. Lî Roma reş, ev çend-sed sal in ku Kurdan bi dek û dolaban dixapîne.

Şîrnex, destpêka qîrkîrina Kurdan e. Çavê wan lê ye, gelek cihan bikin wek Şîrnexê. Süleyman Demirel, mîna xwînwaran nedîgot, sê rojan piştgîriya min bikin, ez kevir li ser kevir nahêlim.

Süleyman, Süleymanê berê ye. De-ma ji Zincirbozanê derketibû, digot: "Ger ku ez ji bo xwe tiştek dixwazim, ez namerd im." Gelek hevalan digot, Süleyman bûye demokrat. Ev bû çend car, ku dema leşker tê, li ber xwe na-de û şebqa xwe hildide û diçe. Ev tay-

betiyek "İttihat Terakî" yê ye. Li aliye din jî, Erdal İnönü heye. Van herdyan û destê xwe dane hev û ji bo tunekirina doza Kurd û Kurdistan li ser kar in. Ev rî, rîyeke tarî ye, ev kuçe, kuçeyet gîrlî ye, kor e. Pispîr û zanayê Süleyman, jê re dibêjin: "Me li Dêrsimê, li Agirî, li Sasonê, li Gelyê Zilan, serhîdanen Kurdan, bi top û teyaran belav kir, ji kuştinê pê ve çare nîne." Lî nafîkirin, ku Kurd, bi kuştinê naqedin, lê roj bi roj zêde bûn. Hemû dinya zane, ku Kurd, ne Kurden berê ne, Kurdistan jî,

Gelê Kurd, di doza mafxwestina xwe de mirinê heq nekiriye. Riya jiyanê mirin nîn e. Li tu derê dînyayê, tu dewlet, ji bo kuştina gel, li dû dek û dolaban nagere, ji xeyni Tirkîyê.

ne Kurdistana berê ye. Pêşiyê Kurdan xweş gotine: "Stûna zilmê çiqas qalind be, ewqas zû dişkê." Dawîya zilmê tû-ne. Şîrnex şewitandin. Jin û zarok, kal û pîr, ketine rî û ji Şîrnexê direvin. Em bangî dinê dike, bila bên vê zilma han bibînîn. Zilma Romê nayê veşartin. Belê ji destê me tiştek tê, ew jî ev e ku em van zaliman bi dinê bidin nasîn. Şîrnex şewitî, belê emê Şîrnexê jî nû ve ava bikin. Emê Şîrnexa Azad, bê kul û derd ava bikin. Edî tu cara me nîn e. Gelê Kurd, gelek mirin û mayînê dîtiye.

Gelek mebûsên Kurd hene ku di nav partiyê ji xeynî HEPê de ne. Ew li wan partiyen ci dikin?, Dengê yekî ji wan, dernakeve. Gelo ew Kurd nîn in? Ên ku di nav DYPê, SHPê û ANAPê de ne, dê dîrok wan wek hevalen xwîn-waran binivîsîne. Qirkirina gelê Kurd, bê buha nîn e. Roj heye ku pîsa vê xwînê ji gelekan bê pîrsîn, ew dem jî nêzîk e.

Hîkûmeta Demirel û İnönü, bê tedarîk hatîn ser kar. Niha jî wek peyayê saziya Ewlekarîya Neteweyî ne 'MGK' û bi fermana wan, dixwazin Kurdan qîr bikin. Em ji dinê re dibêjin, ev şer sî (30) sal dom nake. Ji bo biratiya Kurd û Tîrkan çare heye. Ger ku mafîn Kurdan bên nasîn, gelê Tîrkan xwînê çi mafan be, bê kîmasî ew ji Kurdan re jî bên dayîn, dê ev xwîn bisekine. Divê bi diyalog û peymanan, bingehîn vê biratiyê bên avêtin. Em ji zû de ye vê biratiyê dixwazin. Çare tune, xwîn rijandin çare nîn e, şer çare nîn e. Ev 70 sal in kesî tiştek nedaye Kurdan. Gelê Kurd, di doza mafxwestina xwe de mirinê heq nekiriye. Riya jiyanê mirin nîn e. Li tu derê dînyayê, tu dewlet, ji bo kuştina gel, li dû dek û dolaban nagere, ji xeyni Tirkîyê. Ev eybek giran e, kes nikare xwe ji vê eybê bişo. Gelê Kurd rabûye ser piyan. Gelê Kurd, ber bi banga serxwebûnê ve dimeşe. Kuştin çare nîn e. Gelê Kurd zane ku ev car an jiyan an jî mirin e. Belê wê mirin ji bo neyaran be, jiyan jî ji bo gelê Kurd e. Bila bijî gelê Kurd. Berbang nêzîk e, vaye ronahî derdikeye.

Projeya "GAP", ji bo ser mayedarên Tirkîye gepek mezin e, ku bikaribin daqurtînin, lê ku di qirika wan de bimîne, wê wan bixeniqîne û bikuje...

Di sala 1982 an de li zîndana Amedê faşistê mezin Esat Oktay Yıldırân, dema ku êsîr di rojiya mirinê de bûn, ji Kemal Pîr re dibêje, "Kemal, ezê te daqurtînim." Şoreşgerê mezin û enternasyonalist Kemal Pîr, li ser vê peyvê dikene û wiha bersiv dide: "Esat, ez masiyekî mezin im; dema ku tu bixwazî min daqurtîni, girîng e tu hişyar bî (dîqqat bike)... Masiyên mezin, dasiyên wan jî mezin in. Ji ber vê yekê tu nikarî min daqurtîni. Wê dasiyên min di qirika te de bimînin û te bixeniqînin."

Zilamîn mezin, peyvîn mezin dîkin û pirrayî jî peyvîn wan pêk tê. Kemal Pîr jî şoreşgerek mezin bû, dizanîbû peyvîn, mezin bike. Bi rastî dema ku di dawiya rojiya mirinê de şehîd bû, peyva wî pêk hat. Şehîdbûna wî bû dasiyek mezin û di qirika Esat Oktay Yıldırân (şerlesker û berpirsiyârê zîndana Amedê) de ma. Esat ji zîndanê bazda çû bajarê Stenbolê û li wir jî bi gulleyên şoreşgeran hat kuştin...


Em dixwazin pirsê bînîn ser "Projeya GAP" ê û pesnîn dewleta Tirk; van rojan ku tu kîjan rojnameya Tirkan vekî, tu dixwînî ku pesnê xwe didin. Bi ewqas derfetê (îmkanîn) dewletê dimeşin ser têkoşîna gelê me, lê dîsa jî nikarin têkoşînê bisekinînin. Bes dixwazin hêviya xwe bi vê projeyê ve girêdin û bi vî çavî gel bitîrsin. Yekî ku dewleta Tirk û rabûna gelê Kurd nas neke wê bêje qey bi rastî bi vê projeyê têkoşîna gelê Kurd wê bisekine. Lê em rewşa dewleta Tirk jî û rabûna gelê xwe jî baş nas dîkin û ji ber vê yekê em dibêjin ku ev proje wê bibe dasiyek mezin û di qirika dewleta Tirk de bimîne.

DEWLETA TÎRK PROJEYA "GAP" Û JÎ BO ÇI AVA KIR?

Sedemîn ava kirina projeya GAPê gelek in, lê se-

'GAP' AN GEP

Ş E R V A N



Eger têkoşîna neteweyî tunebûya, wê GAP ji dijmin re bibûya gepek ku bikaribe daqurtîne.


demâ tewra girîng mêtina xwîn û keda gelê me ye. Ev bi dehsalan e ku dewleta serdest sererd û binerîdê welatê me talan dike dikişîne welatê xwe. Bi vê talankirînê welatê me roj bi roj xizan (feqîr) dibe. Li ser keda gelê me û dewlemen-diya welatê me, sermayedariya Tirkî hem dewlemendibe û hem jî welatê xwe ti-jê kargeh, pir, rê û avahî dike. Niha jî dixwaze bi vê projeyê çend tiştîn ku li ser xaka me mane jî talan bike.

Sedemek din jî ev e ku bi vê projeyê dixwaze cînarêne xwe (wek Sûri û Iraqê) têxe bin destê xwe, avê li ser wan qut bike û wan bi xwe ve girê bide.

GELO "GAP", JÎ DEWLETA TÎRK RE DIBE GEP?

Îro lingêne dewleta Tirk ji hêla siyasî ve ji welatê me qut bûne. Di hêla siyasî de gelê me nema dewleta Tirk nas dike. Îro otorîteya gerîla ketiye şûna otorîteya

dewleta neyar. Dewletek ku otorîteya siyasî, ji dest çû, nema dikare peyvîn xwe bi kar bîne. Ji hêla din ve, ji a-liyê aborî ve jî dewleta Tirkî li welatê me pirr ketiye. Hin petrol, komir û madenîn me ji xwe re dikişîne. Hin cotgeh (çiftlik) xaka me jê re talan dîkin he-ne... Lê bi livbaziyan gerila roj bi roj karkirina wan zehmet dibe. Di demek kurt de wê lingê dewleta Tirkî, yê aborî jî, ji welatê me qut bibe. Wê demeke



din dewlet bimîne bê ling. Yekî bê ling çiqasî dikare bimeşe?

Îro dewleta Tirkî bi zordestiya leşkeriya xwe li ser xaka me disekine û dixwaze serdestiya xwe bidomîne. Lê îro hem gel û hem jî gerîla bi têkoşîna rizgariya neteweyî ber bi serfiraziyê ve dimeşê. Ku ev têkoşîn tunebûya, wê GAP ji dijmin re bibûya gepek ku bikaribe daqurtîne. Lê pirr eşkere ye ku dewlet nema dikare gepen mezin daqurtîne û projeya GAP ê jî gelek mezin e.

ÇAVBİRÇÎBÛN DİBE DAWIYA JİYANÊ

Dewleta Tirkî bi çavek birçî êrîsi ser dewlemdiyyen xaka me dike. Ci tê ber destê wê, bi lepan dixwaze bavêje devê xwe. Ew li cem xwe wiha hesab dike ku bi avakirina projeya GAP ê, wê mirovîn wê derdorê bibin xwedîyê kar û bi vê sedemê, ji têkoşînê dûr kevin. Anglo gepen tewra biçûk bide mirovîn wir û gepen tewra mezin bavêje devê xwe.

Lê wek ku me di serî de jî got, gelê me vê leyistokê baş dinase. Îro gelê Kurd xwedî rîber û xwedî têkoşîn e. Kes nikare weke berê, vî gelê hişyarbûyi bixapîne. Dijmin ji xwe re dibêje: "Hin ku PKK gel tev ranekiriye ser lingan, ez çend hestîyan bavêjim ber çend nokeran û bi vê gel bitemirînin û goştîn sor ez bixwîm." Bi rastî ev çav nebarbûn û çav birçûbûn e. Bi sedsalan xaka me û keda gelê me mêtin, êdî bes e. Gelê me nema dixwaze ku neyar keda wî û xwîna wî bimije. Gelê me jî wek gelên cîhanê dixwaze dewlemdiyyen xaka xwe ji bo avakirina welatê xwe bi kar bîne. Ü bikaranîna vê maş gelê me, yê tewra girîng e.

Gotina me ya dawî ev e ku pêşveçûna şerî rizgariya neteweyî, wê projeya GAP ê wek peyva Kemal Pîr bibe dasiyek mezin û di qirika dijmin de bimîne.

Dijmin êdî har bûye û qirika wî ziwa bûye, daqurtandina gepen mezin wiha ne hêsan e. Ev gepa dewlemdiya xaka me, dê wê bixeniqîne.

Necuk



Bi şasti, ku kevirekî pîsik tasek zêrîn
bişkîne, biha nabe pê, ew kevir, nabit
erzan tasa zêrîn.

Osman Sebnî

Hertişto li şon xwe hişt netişto

Du'avyeke Kurdan heye, dibêje: "Xwedê zarokekî baş bide min da ku male min ji min mîrat nemîne". Tişte 'ecêb ew e ku ev gotina hanê ne bûye guhar û ne ketiye guhêne me. Derdê eziyê yê giran di laşê me hemûyan de geriyaye. Dibêjin; rojekê Atatürk ji peyakî xwe re dibêje "Ka derbasî nav Kurdan be û ji bo min hîn bibe hele ka kî serokê wan e?" Peya darê, çû nav Kurdan, ji vî pîrsî, ji wî pîrsî ka kî serokê Kurdan e, herkesî got: "Ez". Peyayê Atatürk vegeriya û jê re got: "Hema hemû serok in", Atatürk keniya û got: "Hema kok tîrsa wan nîne, baş razên."

Xwedê bihêle malbateke Kurd li Parîsê hebû, sîh û du serokê wê hebûn, yanê sîh û du natiştîn wê hebûn. Ji partiyen Kurdan tevan du partî.....ne ketibûne: yekê ne dixwest li ber xatirê Fransa keve; a dinê digot "çîma PKK heye, ez

na kevimê".

Menstîtuyeke Murdî ya Parîsê heye, Xwedê ji ber pîrsiyarêne wê yên pêşin û ji malbatêne wan razî be, Kurdan tê de baz didan, dixwendin, civîn çedikirin, dikirin, li hev rûdiniştin, Menstîtu vingving diçû. Gava mesela nûnertikirina Kurdan gişî li xwe girtin, Menstîtu fangfang çû.

Kurdnenaseke me li Parîsê heye, Xwedê destê xwe di ser wê re bigre; weke tuxtorê jênerâlist bi derdêne Kurdan gişî dizane; ji kurdi pê ve zimanê dinê tevan dizane. Sazbendekî me yî rîdirêj i xulî kirî ji heye, ji

hunermendêne Kurd ên kû mirî Mihemed Şêxo jê derxîne ji ber ku yê sazbend soz da bû ku bête şeva alî-kariya zarokêne Mihemed Şêxo (10 Gulânê 1989), lê bextê xwe reş kir û nehat tevan hez dike, lê ji huner-mendêne hemdemêne xwe yekî baş nabîne. (Rojname, hejmar û binêrin)

Diznivîskarekî me heye, Xwedê temenê wî li Swêdê dirêj bike û li wir bihêle, pêmayêne wî rast li muzêye Stockholmê werin hilanîn, bawer kiriye ku eger sibe Kurdistan jî çêbû, wê dîsa pirtûkêne Kurdi li Swêdê werine çap kîrin!



'Kurd mîletekî Hind-Ewrûpî ye'

Qilaqîla germa havînê, rê û kolanêne Parîsê dişewitîne. Gavan û Sekso ji Swêdê hatine, destêne xwe xistine destêne hev yawaş yawaş di derincikêne Menstîtuyê re hildikşin. Lingêne wan dikevine dîwana Axê. Li dora Axê dusê rojnamevan rûniştî ne. Maxe çayê ji wan re tîne. Xwedanek di ser rojnamevan re dere, yek tê. Rojnamevan dikin nakin nikarin nas bikin Kurd kî ne, ci mîlet e. Gavan û Sekso ji ên rojnamevan bêtir tûre (aciz) dîbin, radibin Axê û Maxê û rojnamevana li jor dihêlin û dadikevin. Têne pişta xwe didine dîwara Menstîtuyê. Gavan stranekê li ser xebat û koka mîletê Kurd çê dike û dibêje, Sekso ji lê radigre:

"Kurd mîletekî Hind-Ewrûpî ye"

Lo me ci kir, me ci kir
Me xulî li serê xwe kir
Ma ne şerm û fedî ye
Axê me nizane Kurd ci ye
Maxê ji dev qîç kiriye
Çend gotinan em ê bêjin
Em ne dîn in, ne gêj in

Hişê me li serê me ye
Her tiş l' ber çavê me ye
Kurd mîletekî nîv Hindî ye
Nîv dinê ji tam Ewrûpî ye
Axê me rû sor û sipî ye
Çavşîn e, porzêri ye
Binêrin eger ne Ewrûpî ye
Maxê ji yekî qemer û reşik
Çav beloqî, por düzîk
Tam wekî Hindîya zerik
Ger hûn dîben: Kurd kî ne?
Kurd mîletekî Hind-Ewrûpî ne
Şer bikin hember nebênamûsiyê
Werin em pişta xwe bidin menstîtuyê
Navê we dengbêj û nivîskar e
Qîmeta we nebe pênc pare
Bê tembûr û saz û şayî
Kî zane Kurd Hind-Ewrûpî?
Kesên nivîskar û sazbend
Pêşin ew bibin Namûsbend
Lo me ci kir, me ci kir
Bi pîri me rûyê xwe reş kir.

D.R.

TÎR



Musa Anter

Şîrnex

Berî niha şest sal berê, min li Mêrdinê dixwend. Wê çaxê xelkê bi dizî ji hev re digotin, "Kuro ji Şîrnexê mala Axayê sor hikûmetê gişt anîne û li ba Hopa Rîsimlê kuştine."

Wek niha ez zanim, wê çaxê ji, ji bo kuştina Şîrnexiyan tevzinok dihatin serê min. Lî ma minê ci bikira, ez zarok bûm.

İcar, yanê niha ez mezin bûme, ma ji bo kuştina Şîrnexiyan ez karim ci bikim?

Disan ji, tevzinok û qehir para min e.

Ez yeqîn dikim, ev şehidîn Şîrnexê niha ji, neviyêne wan şehîden berê ne.

Xwezî ez ji, ji wan şehîdan yek bûma. Ma gelo ew Şehidîn Şîrnexê kêmî şehîdîn Ôhûd û Kerbelayê ne.

Na ez yeqîn nakim.

Tê xuya kîrin ku Şîrnex bûye ala Kurdistana bi şeref. Ji wê alê, xwezî ez piçikek paçık bûma.

Şîrnexi, ji zaliman re dibêjin "hûn ji bavê xwe ve bê minet in. Ma hûnê bi kuştinê me bitirsînin?"

De ka binêrin û guh bidin. Şairê me yê millî, bê ci dibêje:

"Sonda me mirin e.

Di riya te de welat.

Kefen, kirâsê me ye

Mirin, Xemîl û xelat"

Ma iro, ya

Şîrnexiyan ne ev e, ci ye?

Yekî celat hişê wî hatiye serê wî û wiha dibêjê.

"Ya rebî ev ci iş e

Em her ro wan dîkujin
ew pirr dîbin.

Lî ma em

Roj bi roj kêm dîbin."

Cellado weki ku dibêjî.

Qanunê İlahî û yê tebîetê (Xwezayê) tim hevalê qencî û heqiyê ne. Ma wê çawa Xwedê bizrê celladan pirr bike.

Berî niha bi Şest salî wextê Tîrkan Şîrnex dan ber gullan nîfusa Şîrnexe pêncsed nefs bûn. İro bû ne sêzdeh hezar. Lî ez yeqîn dikim, ev zalîmên ku Şîrnexê şehîd kîrin, iro nefs ji wan qeliyane.

Divê mirov vê qenc zanibe, tim insanê bi heq berê wî li xêrê ye.

Ez yeqîn dikim iro ew xatûnên pak ên Kurdan ku zarokêne wan li ber hembêzên wan in û ji ber zilmê bi çolê ketine, ewê pirr dîbin, lê zalîmên Şîrnexê qumandar, tim û polîsên çepal wê kurdünde herin.

Ev kurdûndetî ji aliye xwedê ve, ji niha ve xuya ye.

Ez dibim kefilê Süleyman Demirel û Erdal İnönü, ez sond dixwim, ê bi qesem wê malêne wan bi xelkê bimîne.

Kêfa Özal neynin Welat bixwînin



Turgut Özal dibêje: "Ji xwe kurdî hatiye ji bir kîrin. De bila hema zimanê kurdî serbest be û rojnameyen kurdî derkevin, çawa be kes naxwîne." Em ji dibêjin: "Kêfa Özal neynin, Welat bixwînin"

Modela Îsraîl

Bi banga Turgut Özal, MGK (Saziya Ewlekariya Neteweyî) û heyeta wezîran, li Diyarbekir, di avahiyeş leşkerî de ci-viyan. Turgut Özal, bi vê banga xwe, xweste hem hikûmetê mat bike, hem ji, prestîja xwe zêde bike.

Hin kes hêviya biryarek reformê ji, dikirin. Belê çawa ku di daxuyaniya piştî civînê de ji dîyar bû, dewlet ne li dû çareserkirina pîrsî ye, lê, li dû qirkirin û tunekirina gelê Kurd e.

Ev civîn, bi biryara domandina terora dewletê û berfirehkirina vê terorê qediya. Çawa ku ji gotinên Demirel tê fêmkirin, wê ji iro pê ve, dilsoz û berpirsiyaren têkoşînê, li ku dibin bila bibin, dê li wê bêñ îmha-kin.

Ev metoda han ne nû ye. Li hember gelek têkoşînen neteweyî û çînî hatiye meşandin. Mînaka dawî û ya herî hov ji, kîrinên Îsraîl in, ku li dijî rîexistînen Filistîni dimeşand. Belê Îsraîl nikaribû bi van sûlkastan vê têkoşînê rawestîne. Li tu derê dinê ji, bi van kîrinan encam (sonuç) nehatiye standin. Dewleta Tîrkiyê, li dû qirkirina ye, ala ku Îsraîl daniye, niha dewleta Tîrk hildigire.

Demirel di daxuyaniya çapemeniyê de ji, tehdîtkirina gelê Kurd ji bîr nekir. Demirel mesajekî pirr vekirî da. Di vê mesajê de, ji gelê herêmê re wiha got: "Ya hûnê dev ji doza xwe ber din an ji hûnê bêñ kuştin."

Bi vê civînê ji, baş diyar bû, ku ev hikûmet, hikûmeta serleskeriya Artêşa Tîrk e û li dijî wan nikare tu biryar bis-tîne.

Em di welatê xwe de koçber in

Kurd, dîsa di welatê xwe de, li ser riya koçberê (sîrgûnê) ne. Di dîroka dînyayê de, tu mîlet mîna Kurdan, li ser axa xwe ewqas mihacîri nekişandiye.

Dijmin bi vê qirkirina xwe ya dawîn, Şîrnexê vala

kir. Gelê Şîrnexê, dev ji mal û milkêx xwe ber dan û derketin rê. Belê di vê koçberê de teslimiyet nîn e. Ew, bi vê tevgera xwe, protestoyek li dar dixin. Niha di qûntara Cûdî de ne û ji çiyayêñ welatê xwe

pêştîr, ji xwe re tu war nas nakin.

Dewlet bi bernameya tunekirina Serhildana Kurdistan, bajar, navçe û gundêñ herêmê, bi tank, top û balefiran hildiweşîne. Ev lîstika dewletê xwe bi



Generalê tugaya Şîrnexê Metin Sayar

'Hilweşînin van xaniyan'

Rojnameya Özgür Gündem, binê qetliama Şîrnexê dikole. Nûçevanen Gündem ev büyer bi belge û bandan dan ronahikirin, qeyda bandê di arşiva Gündem de ye.

Gotinên vi kumandari bi temamî ispat dike ku dewletê li Şîrnex provakasyon kiriye.

Kumandare Tugaycî, di dema büyera Şîrnex de, bi deveki pis û bi sıxîf dîştexile. Dijminatiya Şîrnexiyan dike û emir dide leşkeren xwe ku bâjer hilweşînin, kevir li ser kevir nehelin.

Roja qetliamê, Tuxgeneral kin û xezebê dîbarand ser Şîrnex. Kin û xezebê xwe bi gotinên xwe ji diyar kir.

Di banda ku dengê wi té de hatiye girtin de, dibêje: "Hilweşînin! nexweşanê, mizgeftê, depoya avê... xerakin, hilweşînin ku hûn bâjer serûbin nekin heqê xwe ji we re helal nakim. Fişkên we bila neminin, wan xelas bikin."

Endamê meclisa DYP'ê yê Şîrnexê, Şahin Kadirhan dibêje "Birayeki vi kumandari (Tugeneral Metin Sayar) di şerê bi gerilavan re de, hatibû kuştin. Ji ber vê yekê Metin Sayar gotibû " Ku ez Şîrnexê neynim xwarê tîfkin rûyê min."

Bi rastî ji daxwaza xwe ani cih. Légerinên Gündemê vê ispat dikin.

westa Şîrnexiyan wek protesto dinirxînin. Nexwe ne ku çavê wan li penaberiyê ye. Ne tenê Şîrnexî, hemû gelê Kurd ê ku dizanîn û di serwextiya têkoşîna azadiya Kurdistanê de ne, baş dizanîn ku bi penaberiyê û xweavetina hembêza dewletîn imiveryalist tu kes rizgar nabe.

Gelê kurd ji bo axa xwe bi hezaran şehît daye. Ü hemû hewldan û têkoşîna gelê Kurd ji bo welatekî azad û serbixwe ye. Ku armanca gelekî, wela-tekî serbixwe be, wê çawa çav ber de penaberî û koçberiyê. Tu hêz nikarin gelê Kurd ji axa, wî biqetînin, ji ber ku ew bi axa xwe ve girêdayî ye, herdu wek canekî ne.

êrişen Kerboran (Dargeçit) û Çelê (çukurca) eşkere kir. Lewra li gor wan hilweşandina Şîrnexê, bi êrişâ gerîla dest pê kiribû. Lê dewlet, di eynî şevê de, qirkirinek li Kerboran û Çelê ji, pêk anî. Li van herdu navçeyan ji, kevir li ser kevir nehişt. Ji zarokên 12 salî heta pîrên 70 salî herkesi girtin û li tabûran kom kirin. Ev ji nîşan dide ku ev kîrinên dewletê, li gor programek têñ meşandin.

Dewlet li gor programek tunekirinê, li Kurdistanê qetliamek dîmeşîne. Di yek şevekî de, li şîrnex, Kerboran û Çelê, kevir li ser kevir nehiştin. Bi dehan mirovîn Kurd hatin kuştin, bi sedan ji girtî ne. Qirkirinek mîna yê Şîrnexê li Kerboran û Çelê ji pêk anîn. Li van herdu navçeyan, zarokên 12 salî ji, ji malan ber hev kîrin û li qampan civandin, mal û dikanên wan, bi top û tankan hilweşandin. Iro, ji van navçeyan nûce nayê standin.

Piştî qirkirina Şîrnexê, ku PKK bi daxuyaniye got me êrişê şîrnexê nekiriye, dest û piyêñ berpirsiyaren dewletê li hev siwar bûn. Ji wê rojê ve, bi demogojî û derewan, dixwazin vê qirkirinê meşrû nîşan bidin, lê roj bi roj, di wê xwîna ku rijandine de winda dibin. Edî tu kes, bi derewen wan naxape. Rojnamevanen fermî ji, hêstirên tîmsehi dîbarînin ser Şîrnexê, belê bi demogojîyen xwe dixwazin ser vê büyerê binixêmin û tewana (sucê) dewletê sivik bikin.

Gelê Şîrnexê, bajarê xwe vala kîrin, mal û milkêx xwe şemirandin (terikandin) û berê xwe dan çiyayê cûdî. Iro di Şîrnexê de, ji cerdevan, leşker û polisan pê ve tu kes nîn e. Gelê Şîrnexê bi yek dengekî biryara derketinê da û niha di qûntara Cûdî de, şerê hebûn û tunebûna xwe dike.

Qetliamê plankirî û koçberî

Têkoşîna neteweyî û serxwebûnî ya bi pêşengîya Partiya Kar-kerînê Kurdistanê tê kîrin û roj bi roj xurt dibe, pêl dide, û xwe dîghî-jîne hemû deveran; ne tenê ji bo dewleta Tîrk, ji bo dewletê imiveryalist ji, dibe sebebê serêşî û sawêñ mezin.

Dewletê imiveryalist, nemaze Amerika, li ser PKK'ê disekine, plan û programan bi Tîrkiyê re amade dike. Berzanî û Telabanî pîj dike û ji wan dixwaze ku bi Tîrkiyê re têki-

liyên xwe xurt bikin da ku dikaribin li hember PKK'ê bi ser kevin.

Qetliama Şîrnexê parçeyek ji planêñ dewletê imiveryalist û hezîn paşverû ye. Amerika ji dewleta Tîrk dixwaze qetliamê wek Şîrnexê li cihêñ din ji pêk bîne, ji bo ku gelê Kurd perîşan û koçber bibe, bitirse û ji PKK'ê sar bibe.

Li aliye din Amerika dixwaze bi mebûsên HEP'ê re ji bi keve tekiliyê. Piştî Berzanî û Telabanî, niha ji dixwaze mebûsên HEP'ê bixapîne û bi xwe ve girê bide. Bi vî awayî hem wê xwe wek dostê Kurdan nîşan bide, hem ji planêñ

xwe yên qirêj, bi navê dosta-niyê, dê bimeşîne.

Amerika dixwaze Kurdê Bakur ji wek ên Başûr koçber û şepirze bikin û xwe bavêjin hembêza imiveryalîzmê, bi vî awaye wê karibe gelê Kurd ji têkoşîna çekdarî ji, dûr bixîne.

Wisa xuya dike ku mebûsên HEP'ê vê plana sînsî ya im-perialîzmê nabînîn û ji vêga ve têñ xapandin, ji ber vê yekê mebûsên HEP'ê bi navê gelê Şîrnexê bangî nîzanim çend dewletan kirine ku gelê Şîrnexê wek penaber qebûl bikin.

Her çiqas Şîrnexî iro ji Şîrnexê koçber bûbin ji, em hel-

Tebax bû meha vejînê

(Navenda nûçeyan)

Ji destpêka meha Tebaxê û vir de, gel û gerîla bi yek dengekî, têkoşinê bilind kirin. Dewlet bi bernama tunekirina gelê Kurd, bajar û gündên Kurdistânê hilweşandin, bi dehan kes bûn qurbana vî şerî bê qaide. Dewlet vê bernama tunekirinê didomîne, belê bi tu awayî na- gihîje armanca xwe. Lewra gerîla vê terora dewletê bê bersiv nahêle. Bûyeren heftiya derbasbûyi, peşveçûna şerî ge- rîla,bihêzbûn û xurtbûna wî, baş diyar dike. Ji ber vî ye ku dewlet, li cihê ku xwe li ber gerîla nagire, berê xwe dide xelkê sivil û bê çek.

21.8.1992: Gerîla girt ser navçeya Wanê, Çildêran (Çaldiran). Nezikî 100 gerîla saet li dora 20.30 an de ketin Çildêranê. Li gor nûçeyan demek dirêj dengê çekan ji nav- çeyê qut nebû. Ji ber ceryan û telefonên Çaldiranê hatibûn birrîn di derbarê kuştî û birîndaran de nûçe neketin destê me. Wekî din li Elban (Baş- kale) jî, li gündên çortan û Mahmûtabad gerîla dest danî ser çekên Cerdevanan û hej- marek zêde cerdevan bê çek kirin. Gerîla ji gündê Mahmûtabadê 2 cerdevan bi xwe re- dibe, lê dawî berdide.

Li ser riya Qersê, gerîla rê girt û 3 erebeyen "YSE" şewitandin wekî din leşker ciyayê Tendurek bi topan bombe di- kin. Li Mazgirta Dersimê ji erebeyek "TEK"ê hat şewitandin.

Li Bismilê Sixurekî (muxbî- rekî), bi navê xwc Muhittin Yalçın hate kuştin. Di vê hef- tiya dawî de, ev sixurê sisîyan e, ku li Bismilê tê kuştin.

Li Midyadê Hizbî dewlet êrişek bir ser xelkê û 2 yan bi- rîndar kirin. Ji êrişkeran jî yek ji alî xelkê ve hat lînçkirin û mir yek jî bi birîndarî xwe avêt qereqola polisan, ê din jî revi- ya. Polis van êrişkeran ji destê gel xelas dike û diparêze.

Di navbera Hezo (kozluk) û Batmanê de, gerîla rê digrin û 3 cerdevan bi xwe re dibin. Dawî ji gündê van cerdevanan re xeber dişinîn da ku çekên xwedi deynin. Li ser vê hemû cerdevan ji bo çekdanîne diçin Hezoyê.

22.8.1992: Gerîla riya nav- bera Şîrnex û Qilaban (Ulu- dere) nêzikî 5 saetan girt û 6 cerdevan û 4 karmendên dewletê bi xwe re birin. Li Şîrwanê jî 3 cerdevan, ji a- liyê gerîla ve hatin revandin.

Gerîla ji 30 cerdevanen Os- yakê daxwaza devjêberdana cerdevantiyê kir. Li Nisêbinê jî, gerîla avêtin ser qereqoleki û roketan lê dan. Di vê êrişê de polisek birîndar bû û qere- qol jî hilweşiya. Li Hekariyê gunde Miçic 2 zarok pêl ma- yinê kirin. Yek ji zarokan mir ê din jî birîndarê xedare. Li Bismilê jî cesedê sixurek hate dîtin.

23.8.1992: Gerîla li nevçeya Agirî Patnosê êrişek xurt pêk anî. Gerîla saet li dora 22.00 an, de ji çend milan ve ketin navçeyê û avahiya emniyetê, avahiya serleskeriyê, bankayek û avahiya miduriyeta perwerde- kariyê, bi roket û çêkên giran kutan. Ev şer heta 02.00 an



Kîna dîlî keçlikê dê bîbe tolhindana heffsed salt.



(Bîngol) û Diyarbekir ji alî gerîla ve hat girtin. Gerîla polisek dîl girt û şoferek jî kuştin. Li navçeya Mîrdinê Masertê (Ömerli), jîpek leşkera ket kemîna gerîla, 2 yê wî xedar 4 leşker birîndar bûn.

24.8.1992: Serbazek (bin- başı) di helikopterê de, bi gulleyen gerîla mir. Ev serbaz pilotê helikopterê bû. Bûyer li nêzikî Çepekkürê çebû.

Li Çelê (çukurca) 8 cerde- van bûn dîlî gerîla. Li Şîr- nexê jî, qereqola Millî ji aliyê gerîla ve hat hilweşandin, 4 leşker hatin kuştin, 3 jî, birîndar bûn. Li mezrayek Hekarı komek leşker ket kemîna gerîla. 2 leşker mirin 12 jî birîndar bûn. Li Erdîşê 2 cerdevan ha-

domand û gerîla ji herêmê vekisiyan. Pişti gerîla ji navçeyê derketin. hezên dewletê ji xelkê nêzikî 45 kesi girtin. Di vê êrişê de 4 leşker mirin 11 jî birîndar bûn. Li navçeya Ruha Hîlwanê jî, êrişek wiha pêk hat. Saet li nêzikî 22.00 ande, qereqola cendermeyan û avahiya emniyetê bi gulle û roketen gerîla hatin kutan. Pişti êrişê, ji gel nêzikî 50 kes hatin girtin. Li gundekî Erdîşê cerdevanek hat kuştin, yek jî hat birîndarkirin, li gundekî Erdîşê

din jî, qereqolek hat hilweşan- din. Di dermafê kuştiyan a- gagî nîne. Riya Çepekkür

Pilot hate kuştin.

Li navçeya Çepekkürê (Bîngolê) Darahênenê (Gêncê), pilotê firoka leş- kerî Oğuz Özkan (Binba- şı) roja 24.8.1992 di firo- ka xwe de, bi gulleya gerîla hat kuştin. Serbaz ji bo

operasyanê ji Diyarbekir ber bi Darahênenê ve diçû. Berya vê êrişê rojek, le herêmê di nav hêzên dewletê û gerîla de şer derketibû, di vî şerî de gerîla polisek revandibû

tin kuştin. 27 cerdevan, ji nav- çeya Hezoyê ku çek danî bûn ji alî leşkeran ve hatin girtin.

25.8.1992: Riya Licê û Di- yarbekir, ji aliyê gerîla ve hat girtin, 10 leşkeren ku ji bo şer sewqî herêmê dikirin, ji otobo- sekî anîn xwarê û gullebaran kirin. Di vê êrişê de 7 leşker hatin kuştin 3 jî birîndar bûn, 3 kes jî, ji aliyê gerîla ve hatin revandin. Di vê bûyerê de, ji ber ku leşkeran dianî herêmê otobosek jî hate şewitandin. Li navçeya Çepekkürê, Da- rahênenê (Gêncê) di nev gerîla û leşkeran de şer derket. Di vî şerî de 2 serbaz (astsubay û ast- teymenek) û 2 leşker hatin kuştin, 2 leşker jî birîndar bûn. Li gündê Nisêbinê, Girêbiya, erebeyek leşkeri ket kemîna gerîla. Di vî êrişî de serbazek (astsubay), çawişek pispor (uzman çavuş) û 2 leşker hatin kuştin.

Li Sasonê, herêma Newala Giyana, gerîla rê digire, serba- zek (yüzbaşı) dîl digirin û ere- beyen 'YSE' şewitandin. Hizb-i dewlet li Batmanê we- latparêzek kuşt. Gerîla bi ser şantiya şirketek girt û ere- beyen şirketê şewitandin.

Li ser riya Çepekkür û Er- zeromê 7 leşker bûn dîlî gerîla, 2 erebe ji hatin şewitandin.

26.8.1992: Li Kemaha Er- zînganê (Erzîcanê) 4 leşker hatin kuştin, 3 jî birîndar bûn. 4 leşker li ciyayê Munzurê hatin kuştin, 3 jî birîndar bûn Trênekî, li hêla Bismilê hate şewitandin. Ev bûyer li nêzi gündê Sînanê çebû. Karîstanâ cixareyan a Bestê, li Bedlisê hate şewitandin.

27.8.1992: Li navçeya Dîlûk (Entab) Arabanê, li gündê Korhecî, di şerî nav leşker û gerîla de, 4 gerîla mirin. Li gündê Dara, ku girê- dayê navenda Mîrdinê ye, endamekî Hizb-hi Kontra, hate daleqandin. Li Nisêbinê 2 endamên Hizb-i Kontra, bi navê xwe Şükrü Keskin û Süleyman Güler hatin kuştin.

û yekî jî kuştibû. Dotira rojê jî, ev şer didome û fi- rokên leşkeri ji bo bombe- baranê bi ser gerîla ve di- çin. Gerîla jî, gulle dîbarî- nin ser van firokan û pi- lotê firokê birîndar dikan, alîkarê pilot, firokê dibe. Bingolê, lê belê serbaz nafilitê .

PÊNÛS

Amed Tigris



Demirel û pluralîzm

Hefteye berê Süleyman Demirel li çend navçeyên Stenbolê qise kir. Demirel mîkrofonên kanalên TV'yan digirtin destê xwe û ji xelkê re digot:

Ha Tirkîye ev e. Ka binêrin çar mîkrofonên cuda cuda di destê min de ne, ev nîşana demokrasî ye, ya pluralîzmeye.

Temaşevanan; jê re çepik lê didan û polîsan jî amîgotiyê dikirin û diqîriyan: "Bijî Tirkîye" digotin.

Demirel jî diqîriya "Bijî Tirkîye" digot dom dikir:

Çend terorîst dixwazin Tirkîye perçê bikin. Ez dê di pozê wan de bînim der.

Ezê heta nefesa xwe ya dawî li dij wan bim...

Ne bi çar mîkrofonan, bi 104 mîkrofonan jî, ne li Tirkîye pluralîzm çâdibe û ne jî demokrasî tê. Ji xwe Demirel û demokrasî li dij hevdu ne. Wek gur û mîh; av û agir; ronahî û tarî. Wek reş û spî.. Ne bi tenê Demirel, herwiha hemû Kemalîst nahêne guhertin. Ji ber ku Kemalîzm nijadperestî ye. Îdeolojiya nijadperest, nabe demokrat û pluralîzm. Herdu li dij hevdu ne. Dij-minê hevdu ne.

Li Tirkîye tenê partiyek, rojnameyek, zanîngehek, mîzgeftek, televîzyonek, radyoyek heye. Lewre di nav wan de tu ferqek nîne. Hemû bi yek devekî dipeyivin. Hemû Kemalîst in. Berdevkê Dewletê ne.

Cihê ku yek hebe, divê yê din tune be. Wek me got av û a-gir an jî agir û bârût. Herdu bi hevdu re nabin. Li Tirkîye heta ku Kemalîzm hebe demokrasî û pluralîzm nabin. Karbîdestêñ Tirk dixwazin di çavê dînyayê de û bi tay-beff de çavê Ewrûpiyan de xwe demokrat û pluralîst nîşan bidin. Lî, ew nikarin Ewrûpiyan bixapînîn. Ewrûpî jî êdî baş pê dizanîn, ku ji destê Kemalîzmê were li Tirkîye fîrsenda jîyanê nade tû hêz û kesî. Tirkîye her çîqas xwe demokrat, pluralîst nîşan bide jî, dîsa Ewrûpî dizanîn, ku li Tirkîye bi tenê îdeolojiya resmî heye. Ew jî Kemalîzm e. tiştîn din hemû formalîste ne.

Li Tirkîye bi tenê partiyek, rojnameyek, radyoyek, universiteyek, ordiyek, camiyek, mîletek heye. Mesela tu ferqa rojnameyên Hürriyet, Cumhuriyet, Milliyet, Sabah, Güneydin tune ne. Hemû dewleta Tirk a nijadperest diparêzin. Ferqa partîyen Ecevit, Demirel, Türkîş, Erbakan Înönü, Mîsüt Yılmaz.. tunin. Hemû dewletçî ne. Hemû Kemalîst in. Hemû dijminen gelê Kurd in. Yek ji ya din Kemalîstir e. Niha çend kanalên TV' yên Tirkân hene. Hem ên şexsî û hem jî yên resmî, hemû Kemalîzmê û dewletê diparêzin. Wek dengen waliyê Amadê ne. Wek dengê polîs û leşkeran e. Hem jî, ji wan çendek li Ewrûpa weşanê dikin. Di nava demokrasiya Ewrûpî de jehra Kemalîzmê belav din. Lî ci ferq di nav kanalên Înterstar, Avrasya, Teleon û Show tv de hene? Na bi Xwede tu ferq tune!

Wek Demirel dibêje, Pluralîzm, ne zêdebûna hejmarañ e. Pluralîzm û demokrasî zêdebûna serbestbûna bîrûbaweriyan e. Serbestbûna rîexistina bîr û bawerîyen cuda cuda ne. Parastina mafîn demokratîk û netewîyên hemû netewe, gel, kom û çînan (sınıfan) e. Pluralîzm û demokrasî, ne pesindayîna Kemalîzmê ye. rexne lê girtin e. Ji navê rakiña wê ye.

Demirelê Demokrat û pluralîst (!) hebûna 20 mîlyon Kurdî ïnkar dike. Hîn nahêlê ew bi zimanê xwe bixwînin û bînîvisînin. Ew kes û rîexisten ku behsa heqê Kurdan ê neteweyî (mîlî) û demokratîkî dikin, leşker û polîsîn Demirel, bi tank û topan, gund û bajîrên wan bi erdê re rast din. Ji aliyêñ din ve Demirel, mîkrofonên ÎnterStar, Teleon, Avrasya û Showtv digire destê xwe nîşan dide û diqîre "ev demokrasîye. Ev pluralîzm e..." dibêje.

Wiha xuya dike, ku dê emrê Demirel û pluralîzma wî kin be. Heta niha du caran genaralaran Pluralîzma Demirel li sere wî pêçan. Lî vê carê ne genaral, Kurd têñ mamê Silê!

Dewlemendiya zimanê kurdî

Kurdino! Zimanê xwe bê xwedî nehêlin, li zimanê xwe xwedî derkevin. Kitêb û rojnameyên bi zimanê xwe bixwînin. Bi kurdî bifikirin, bi kurdî bipeyivin. Zimanê xwe biçûk nebînin, ji ber zimanê xwe serbilind û enî vekirî bin.

Huseyîn Deniz

(2)

Di kurdî de hêjîr, çawa dibe hêjîr? Gava ku nû hêjîr li darê dikeve, bibikkivê, bi kurdî dibêjin kerrik. Kerrik dibe fe-qoh, dûra berete çêdibin. Hêjîr distewe û paşê jî diperixe,.....; kerrik, feqoh, berete, stewyayî û perixî... Ev çêbûna hêjîra ê reşik, ê bejik, ê elwêni, ê termosî, û ruhanî, ê tîrîk, ê payîzî, ê zeytûnî, ê ziqaqî û ê bi stirî... Bi tirkî ji tevan re dibêjin, încîr. Kerrik ji încîr e, feqoh jî, berete jî.... giş încîr in.

Di zimanê kurdî de tiryê terr (şîn) tîrî ye, ê hişk jî me-wîj e. Bi tirkî ji herduyan re dibêjin, üzüm. Li gora tam a wan, rengê wan û şapatê (mevsimî) wan jî gelek navê tiriya heye. Wek:

Tiryê dirêjik, ê kerkûş (tiryê ku jê mewîj çêdibe ev e) ê merzone (tiryê ku ji bo dimsê bas e ev tîrî ye; nabe mewîj), tiryê reşik (dibe me-wîj lê nabe dims), tiryê sitû (heta zivistanê jî dimîne dereng çêdibe, tiryê misebiq (berî hemû şiklîn tiriyan distewe, ji bo xwarinê ye), tiryê etfi (bi dû tiryê misebiq de distewe, ji bo xwarinê ye), tiryê sincêrî (liben wê hûr in û di nav hevde ne, tof e), tiryê

qirfok (dibe mewîj, mewîjê wê zer e û ji hemû mewîjan xweşîr e), tiryê hesenî, tiryê diwanî...

Di kurdî de tuyê Şêmî, ê Helebî, ê reşik, ê xemlik... he-ne...

Gwîz suwarî qaşil tenik in, bi xwe tîn qeşartin. Gwîz kûrîk qaşil qalind in, bi hêsanî nayêñ qeşartin, kakîlê wan sax dernakevin. Gwîz jî hene, ne qaşil qalind in, kakîlê wan sax dernakevin. Gwîz jî hene, ne qaşil qalind in û ne qaşil tenik in, kakîlê wan jî bi hêsanî derdikevin.

Hinar jî şikil şikil in: Hinare tirîş hene, ê şêrîn hene, hinare ruhanî, hinare reş... hene.

Di Kurdî de kew heye, çêlkew, mîkew, nîrkew, kew-sûsk û kewçîrî heye. Bi tirkî ev tevde keklîk in.

Tirk ji amojojn, xalojn, bira-jin, jinxal, jinap, jinbir, jintî, jinan re dibêjin; yenge.

Süpürge ya Tirkî bi zimanê me melkes e, gezik e, sivnik e, bermalk e, ye.

Bêvil, difin, poz, kefi, zin-cî... di tirkî de hew burun e.

Em karin gelek peyvan gotinan li vir rîz bikin. Lî ne hewce ye. Herkes zane ku zimanê koçeran (cîguherok a) nabe wek zimanê mîletê ku ji cihê xwe neqîliqîne. Tirk koçer in, Kurd jî ji bav û kala de

ji welatê xwe derneketine. Ku cih guhertibin jî (surgubûna wan ne tê de), di welatê xwe de guhertine. Yanî ji Dêrsimê belkî hatine Siwerekê, ji Mêrdinê çûne ciyayê Kurdan yan jî, ji jér hatibin jor... Lî ma Tirk wilo ne? Ji Asyaya Navîn hatine van erdan û derbas jî kirine. Jîna wan li ser hespan bihuriye, qûna wan erd ne girtiye. Bi axê, bi erdê, bi dar û bera tu têkiliya wan nebûye. Zimanê wan jî li gora jîna wan, rewşa wan, rabûn û rûniştina wana ye. Ji xwe wê gelek peyvîn ku di kurdî de hebin, wê di tirkî de tune bin. Ji xwe ku jinbirayekî Tirk, jinapa wî, jinxala wî, jintiyê wî li hev rûniştibin û ku bêje yenge wê hemû lê binerin.

Bi kurtasi em bêjin; zimanê Kurdan yanî kurdî, zimanek fireh e, zengîn e (dewlemend e), ne kêmî zimanê mîleten cîrana ye.

Tewer tu cara ne kêmî tirkî ye, ji tirkî zengîntir e. Bi vê rebeniya xwe, zimanê Kurda xwedîyê ferhengek heftê hezar gotin e.

Kurdino! Zimanê xwe bê xwedî nehêlin, li zimanê xwe xwedî derkevin. Kitêb û rojnameyên bi zimanê xwe bixwînin. Bi kurdî bifikirin, bi kurdî bipeyivin. Zimanê xwe biçûk nebînin, ji ber zimanê xwe serbilind û enî vekirî bin. Kewtî amojin, xalojin, bira-jin, jinxal, jinap, jinbir, jintî, jinan re dibêjin; yenge.

Hejmara Rewşenê ya şesan derket

Rewşen kovareke Navenda Çanda Mezopotamîyê ye. Ev kovar, mehê carek dertê. Kovar giraniya xwe dide xebatê çandî, hunerî, wêjeyî û dîrokîyê.

Dî vê hejmara Rewşenê de ev nîvîs hene.

S. Rêving: "Divê Em Xwe Ji Alfabetîbzûna Tirkî Xelas Bikin". Ev gotar berê di Armançê de derketibû. Gotar li ser gelş û gelemşen alfabe û rastnîvîsına kurdî hatiye nîvîsin.

Servan: "Birîna Dilê Min". Kurteçirokek e. Li ser têkiliyên şoreşeran û gundiyan e.

YRWK: "Halkın Aydını, Halkın Savaşçısıdır". Nîvîs ji hêla Yekîtiya Rewşenbîrêñ Welatparêz ên Kurdistan ve hatiye nîvîsin. Nîvîs li ser rengê rewşenbîrêñ Kurd rawestiyaye.

Mîrhem: "Demokrasi, Şo-

res, Ewrûpa û Rewşenbîrêñ Me". Mîrhem, di vê gotara xwe de li ser rengê şoreşâ Fransa, demokrasiya Ewrûpa, nîrînên wan ên di derbarê dînyayê de bi taybetî jî, li ser Rojhîlata Navîn û rewşenbîrêñ Kurd ên ku li Ewrûpê dijîn, radiweste.

Abdurrahman Durre: "Ehmedê Xani". A. Durre di vê nîvîsa xwe de debaşa Xaniye hel-bestvanê neteweyî dike. Xani hê di sedsala 17 an de debaşa neteweperiyê dike. Di dema vî de, ne li Rojhîlata Navîn û ne jî li Ewrûpa ramana neteweperîti nîn bû.

Hinek nîvîs jî ev in:

Selahedîn Mîhotullî: "Cerd". Dr. Cemîd Bender: "Boşlukları Doldurmak". Feqî Huseyîn Sağnîç: "Ziman".

Zulfîkar Tak: "Koleye Bi Ziman Ne Tiştek e". Medenî Ayhan: "Kültür Sanat ve Edebiyatımızda Üretim, Kişiîlik Değerlendirilir" û hwd.



Kovara Rewşen

Fevzî Bilge: "Rexneyîn Li Ser Wêne û Hunerên Politîki".

Zulfîkar Tak: "Koleye Bi Ziman Ne Tiştek e".

Medenî Ayhan: "Kültür Sanat ve Edebiyatımızda Üretim, Kişiîlik Değerlendirilir" û hwd.

Folklorê ma ra: yew yarı

Saw-maw

Rojan a yew rojêdo omnanî yo. Tinci hetanî ki ti zanî hadibî. Suya koyan deriyabî (dakewtibî) Roji taştare xwi ra pey verdabi ver bi êri ra şinê. Dewi miyan di şematê qeçan (gedan, domanan) tê qelîbiyabi. Yew rayan qırıqıra dikan zî enê vengan rê enbazê kerdêne.

Xal Beko orxmedê xwi ser o, seyda bandê xwi di cemhatî rê lûlî puf kerdêne (cenaynê). Eno nabêni di zî yew rêu, yew cenêki qantiri wanaybî cor di hetê Hopi ra hameynê. Rêwi ki xwi nizdikê keydê Xal Bekoy kerd va:

-Silamû cleykûm!

Cemhatî va:

-Eleykûm silam!

Xal Bekoy Mire şinas-

naynê. Rêwi Hopi ra bi. Xal Bekoy Mirî ra va:

-Mirê mi xeyr o! To cenêki xemilnaya qantiri wenaya sera benê?

Mirî va:

-Kerwa Beko, xeyr o. Cenêki tikêkê nerehet a; şew nêrawkena, hewndê xwi di bêxebir qalî kena, nêzano saw-maw (aswas) serkewto çiyo. Mi va, ez ja bera Ziyarda Bilqasimî ser. Ez vana ma eşmo ziyar ser o rawkî belku Ellatê'ala yew şifa xeyrî bido.

Xal Bekoy va:

-Mirê mi, ti cenêki biyari emşo ewta verdi, Kevoti (Kevoti ceney xal Beko ya.) beri û serê sibhay bê, eger aswasê ja mend, ti ci mi ra vanî se vaji.



Xal Beko senê ana va, Mire, cenêki û cemhat heme tê reydi yew bilqî bi jîno guniyay, pêro hiwî ra quzulqurtî bî.

Mirî ki cemhatî ra xatir warşî si, cemhatî Xal Bekoy ra va:

-Enkay lila Xal Beko 'eyb

nêbi to ana va.

Xal Beko cemhatî ro tadiya va:

-La şima çiqas delû yî, Mire extiyar o, cenêki ciwan a, helbet cenêki şew aswas kena.


Xal Beko: Hembêl ra wo û çerçî bi. Çiqas dewi ay

dormî bî hemînî yo şinas-naynê. Belawo ki zaf teriq-naynê, se bivatenê, çewerî qalandê jê ra xuwi nêkerdenê.

Himbêl-Hopi: Di dewê vezada Piranî (Dicle) yî.

Arêkerdox: Mihem Himbelij

Destpêka edebiyata Kurdi



Pirtûka nivîskar Mehmet Uzun "Destpêka Edebiyata Kurdi" di nav weşanên Beybûnê de derket. Pirtûk bi zimanê kurdi hatiye nivîsandin.

Bi rastî Mehmet Uzun bi çavekî rexnegirî û bi dîtineke zanîti li ser ziman û Edebiyata Kurdi sekiniye. Ji bo vê xebata xwe jî gelek çavkanî berhev kiriye û bi vî awayî jî lêkolîna wî kin, lê dewlemend e. Di pirtûkê de ziman û Edebiyata Kurdi û dîroka wî, di binê heşt sernavan de berhev bûye.

Mehmet Uzun di destpêkê de pêşî li ser têkiliyên ziman, edebiyat, rewşa Kurdistanê û jîna civakî disekine. Wiha dibêje Mehmet Uzun: "Gelek caran daxuyaniyên siyasi û edebiyat li hev nayê. Lê kesekî ku li ser Edebiyata Kurdi bisikine,

gerek e li ser rewşa siyasi û rewşa Kurdistanê jî bisekine. Ji ber ku li Kurdistanê weke her tiştî edebiyat û zimanê kurdi jî bi siyasetê û jiyana civakî ve girê dayîye.

Ji ber van sedeman jî Mehmet Uzun pêşî bi kurtî li ser dîroka Kurdistanê disekine û paşê jî pêşneketina Edebiyata Kurdi bi şertîn siyasi û rewşa Kurdistan ve girê dide. Û dibêje: "Edebiyata Kurdi têkoşîna man û nemanê ye." Mehmet Uzun pêşî qala Edebiyata Kurdi ya klasik û behsa helbestvanen ku di vê demê de (sal 1500 û 1800) di bin mîrekiya Cizîra Botan, Ardalan û Baban de jiyane dike. Wek Ehmedê Xanî, Elî Herîri, Melayê Cizîri Feqîyê Teyran, Nâli, Salim û hwd. Mehmet Uzun dibêje "Wê deme welat ê Kurdistan hê tam perçe nebûbû û Edebiyata Kurdi a klasik baş bi pêşve çûbû."

Mehmet Uzun li ser zaravên zimanê kurdi jî disekine û qala Edebiyata Kurdi ya devî dike. Piştî pirtûk tê ser Edebiyata Kurdi ya nivîskî. Edebiyata Kurdi ya nivîskî ji Mem û Zînê tîne heta edebiyata nûjen a kurdi.

Mehmet Uzun edebiyata nûjen di binê sê sernavan de dicivîne. Sedema vê jî wiha tîne ziman "Ji ber ku perçebûna

welêt dijwarî û zehmetiyan ku doralîyen ziman û Edebiyata Kurdi rapêçane hem rê li pêşketina ziman edebiyatê girtiye û hem jî rê li yekîtiya wan girtiye. Ji lewre edebiyata kurdi tu cañî yekîtiya xwe ne anîye pê û li ser şopekê ne herikiye."

Di pirtûkê de Mehmet Uzun, di bin sernava "Edebiyata Kurdi li Kurdistana Îran û İraq" li ser xebatên edebiyatê yêni li Iraq, Îranê çêbûne disekine. Ji rojnameyan bigrin ta kovar û pirtûkan mînak bi mînak li ser wan û nivîskarên wan disekine. Ji xeynî vê jî di bin du sernavan de qala Edebiyata Kurdi ya Kurdistana Bakur û Kurdîn Yekîtiya Sovyetî dike. Di bin van sernavan de Edebiyata Kurdi ji sal 1900 heta vê rojê tîne. Ji rojnameya Kurdistan digire ta helbestvan Yılmaz Odabaşı, qala berhemîn Kurdan yê edebî û nivîskaran dike.

Weke me li jor jî got bi rastî jî, ev lêkolîna Mehmet Uzun kin hatiye girtin lê ji aliyen çavkaniyê ve zêde dewlemend e. Ku hûn bixwazin di derbarê Edebiyata Kurdi de hin tiştan hîn bibin pêwist e ku vê pirtûkê, ji destê xwe qet dernexin. Ji bo pêşketina Edebiyata Kurdi lêkolînen wisa dewlemend gerek e roj bi roj zêde bibin.

'Evîna Cemîlê'

Cengiz Aytmatov



Wergîr: Naci Kutlay

Weşanên bi zimanê kurdi, ji derketina rojnameya Welat û vir ve roj bi roj zêde dibin. Nemaze di van du sê mehîn davî de pirtûkên cur be cur bi zimanê kurdi derdikevin piyasê. Ev pirtûk bi pirranî helbest, lêkolîn û listikên tiyatroyê ne.

Nivîskarên Kurd di ber van xebatên xwe yên orijinal de, li ser wergeren hin pirtûkan jî xebatê dikin.

Berî demekê, yek ji van pirtûkan, ji hêla Naci Kutlay ve hate wergerandin. Ev pirtûka bi navê xwe "Evîna Cemîlê", ya Cengiz Aytmatov e û eslê wê bi zimanê qirxizî hatiye nivîsandin.

Helbestvanê Fransiz ê navdar Louis Aragon, heyranîya xwe ji bo vê çirokê de mirov geleq tişt di derheqê civaka Qirixizan û adetên wan hîn dibe.

Aytmatov, bi awayekî welê xweşik tesvîra çiya, deşt, newal û zeviyan dike û ji jiyana Qirixizan bi taybetiyen balkêş bi zimanekî wisa herikî pêşkêş dike ku mirov bi xwendîna carekê, jê têr nabe.

Wergera pirtûkê jî, bi rastî, bi mirov nade hisandin ku werger e, weke ku bi zimanê kurdi hatiye nivîsandin.

Bi kurdiyeke sivik, rast û edebî hatiye wergerandin.

Kurdiya vê pirtûkê pîr nêzikî kurdiya rojnameya Welat e. Ji ber vê yekê xwendînanen Welat vê pirtûka tenik (76 rûpel) bi hêsanî wê karibin bixwinin.

Pirtûk ji aliyê weşanxana "Firat Yayınları" ve hatiye weşandin.



Memduh Selim Beg (li aliyé çep)



Celadet Bedirxan



Ekrem Cemil Paşa



Qedri Cemil Paşa

Rûpelek ji dîroka Kurdistanê: Xoybûn

Kamîran Haco

Di hejmara Welat a 6. de gotareke kin bi navê (serpêhatiyen Qedri Cemil Paşa û Musa Anter) hatiye nivîsan din. Nivîskar Huseyîn Deniz li ser pirtûka (Doza Kurdistan) ya Qedri Cemil Paşa di axive. Di stûna duduyan de, gotina (Xoybûn) derbas di be, nivîskar H.D. ev gotin çawa bi tirkî xwendîye wilo nivîsiye û diyar e ku haya bîrader H.D. ji dîroka Xoybûnê nîne û madem nivîskarekî me haya wî jê nîne, helbet pirraniya milet jî wê jê xafîl bin.

Hoybûn, tê bi maneya (wateya) hînbûnê, lê belê Xoybûn tê bi wateya Serxwebûnê û ji bo ku mirov qurçikîn tarî ji dîroka xwe baştı binase, min ev gotar nivîsan diye.

"Xoybûn, an ji xweybûn, rêxistîneke konevanî (siyasi) ye, di tebaxa 1927 an de hatiye damezrandin li Bêrûdê, paytexta Libnanê*. Endamên rêxistinê Kurdî yê berê, weke (Kurdistan Tealî Cemiyeti), (Kürt Teşkilat Cemiyeti), (Kürt Milliyet Fırkası) û (Komîti du lê indipens Kürt) û serek eşîren welatparêz di kongera damezrandinê de hazir bûne. Kongerê wan 45 rojan dom kiriye û dawî her endamekî (sonda bîratiyê) xwar, di sonda xwe de soz didin da ku xebatê bikin ji bo serxwebûn û yekîtiya Kurdistanê"(1).

Li gor mirovekî ku di kongra damezrandinê de amade bûye, Ehmedê Ebdilrehman Axa, endamên damezrandinê

ev in:

- 1- Celadet Bedirxan Beg
- 2- Elî Rizayê kurê Şêx Seid
- 3- Memduh Selîm Begê wanî
- 4- Doktor Şukrî Mihemed
- 5- Fehmî Beg (katibê Şêx Seid)
- 6- Kamîl Efendî (Mulayîm bû li Iraqê)
- 7- Kerîm Efendî (Ew ji mulayîm bû li Iraqê)
- 8- Tewfîq Efendî (Mulayîm bû li Tirkîyê, bazzabû cûbû Iraqê)
- 9- Haco Axa (Serekê eşîra Hevrîka)
- 10- Emînê Ehmed Lawê Perîxanê (Serekê eşîra Rema)
- 11- Bedredîn (Serekê eşîra Hebîzbinî)
- 12- Bozan Beg
- 13- Mustefa Beg (Her du serekê eşîra Beraza)
- 14- Ehmed Ebdilrehman Axa (kurê Şahîn Axa)
- 15- Abdûfah Cizrawî. (2)

û dawî dibêje ku Xoybûn ji 12 endaman hatiye çêkirin û her sê kesen ji van 15 an ku neketine Xoybûnê kî ne em nizanin ji ber ku E. Ebdilrehman Axa vî tiştî diyar nake!?

Di Adara 1929 an de Qedri Cemil Paşa û Ekrem Cemil Paşa, ji Diyarbekirê derketin, berê xwe dane Sûri. Li wir bûne endamê komîta navendî (merkezî) ya Xoybûnê...

Programa Xoybûn hate danîn û di xala 2 an de, hate nişandan ku kar û barê yeke-min ev e: "xebat dijî Tirk ta derxistina leşkerên dawî ji qada (erda) Kurdan i muquedes" û ji bo vê yekê xebata çekdarî dîtine wek riya xela-

siyê... xala 3 an, ji program dibêje: "çekirina hêzên kurdî taybetî û çekkirina (silahkîrin) van hêzan bi çekên nû û modern... û gereke ev hêzên ha bikevine bin serokatiyek leşkerî ya yekbûyî ... û cihê vê serokatiyê di çiyayê Kurdistanê de be...." (3)

Ev tiştî diyar dike ku endamên Xoybûnê Serxwebûna Kurdistanê û yekîtiya wê dabûne ber çavên xwe, û dîtinek durust li ser reng û riya xebatê danîbûn û dijminê xwe baş nas kiribûn... û li gor prensîbê ku tiştîn bi zorê çûyî, ne bi zorê be, venagere, dixwestin ku kar bîkin.

Ji alîkî ve hate xuyakîn di program de ku Xoybûn dixwaze têkiliyan bi dewletên nêzîk û cîran re çêke, nemaze ew dewletên ku dijminatiya wan bi Tirkîyê re heye ev ji diyar dike ku Xoybûn dixwest ji vê yekê Sûdê (fêde) bistîne... Di xala çaran de tê gotin: "Ayakirina têkiliyên biratî bi hikûmet û miletê Îranê re..." (4)

Û ji ber tengnerîna Xoybûn, tu tiştîkî ji bo çêkirina têkiliyên biratî bi gelê Tirk re, di programê de dananîn. Lewra di meydana pratîkê de tu hevalbendên Xoybûnê çênebûn, ji bili Partiya Neteveyî ya Ermenî (Taşnaq), ew partî ji nêrînêwan, teng bûn.

Dewleta Tirk xwest ku Xoybûn nişan bide weke nokeren Ermenan û destik di destê wan de, ji bo ku navê Kurdayetiye li ser hilîne, û car din li ser bingehêke olî, di navbera Xoybûn û gelê

Kurd de dîwaran ava bike... Lî belê neçû serî... Di Nîsanâ 1928 an de Xoybûn belavokek derxist, têde dibêje: "Xoybûn ne destikek di destê dewletên biyanî de ye. Armanca wê rizgarbûna gelê Kurd e. Û avakirina Kurdistanê serbixwe ye... û ji bo vê yekê Xoybûn pişta xwe daye hêzên xwe yên taybetî bi tenê (îtimadê li xwe dike.) (5)

Zinar Silopî (Q. C. Paşa) hin vekirîtir û eşkeretir vê yekê diyar dike: "Rewşa ku Xoybûn têde ava bû, ferz kir ku têkîlî bi Ermenan re çêbin... ji ber ku gerek bû ku propagandeke xurt û jîr were pêkanîn da ku cîhan me, nas bike... di wê dema ku derfetên Kurdan tune bûn... û tu hêzên siyasi yan jî dewlet li pişt Xoybûn nebûn... û ji Xoybûn nedihat ku têkiliyên durust û xweşik di nav perçen Kurdistanêde çêke... ji ber van hemû tiştan dît ku girîng e bi Ermenan re têkiliyân çêke... û ji hemû girîngir ku ew propaganda Ermenî li dijî Kurdan hate guhertin û bû propagandek ji wan re..." (6)

Eger mirov bi kûrbûn li van têkiliyan binêre wê bibîne ku pirr girîng û baş bûn...

ji ber ku qirkirina Ermenan di sala 1915 an de çêbû. Yanî piştî 12 salan ji birîna wan a kûr, dest pê kirin careke din bi biratî desten xwe dane Kurdan... ev yek îsbat dike ku Ermen gihabûne wê baweriyê ku Kurd di demekê de bûbûne destik, û kirinê wan li dijî Ermenan, ne bîyareke siyasi bû ji alî Kurdish

ve... û ji alîkî din ve îsbat e ku kurd jî gihabûne zanebûneke ku karibûn rî li dijiminê xwe bigrin, û wê dijiminatiya ku Tirkân xwest bi xe nav Kurd û Ermenan li ser bingehêkî olî... biguherin û bikine dostanî û hevkarî...

Xoybûn guhê xwe da aliyê propagandê û nivîsandina belavok û pirtûkan... û ji bo vê yekê gelek beş ji xwe re li derive, weke Libnan, Sûri Amerîka... û gelek dewletên Ewrûpî, çêkirin... û ji alî nivîsandinê ve di desten me de pirtûka (pirsa Kurdî) ya ku nivîskarê wê Belec Şérko ye. (7) Li ser nivîsiya (belavoka pêncan), demek çar pirtûk, yan broşur berî vê hene lê çi ne û li ku ne, em hê jî nizanîn.

Çavkanî:

1 : Çapa Erebî ji pirtûka (Tevgera Kurdî, Di hemdemâ Nûjen De) Beyrut 1992. 5 nivîskar in, Celîlê Celîl, M.S.Lazarêf, M.A.Hisrestyan, Şakiro Mihoyan, Olga Cigâlîna. rûpel 164.

2 : Kovara Armanc, hejmara 91, Nîsanâ 1989 an, rûpel 5.

3 : Jêderê (1) rûpel 164 an. Beyrut 1992

4 : Pirtûka Dr. Hamid Mehmed İsa Eli, bi navê (Pirsa Kurdî Di Rojhîlata Navîn De, Ji destpêkê û Ta Sala 1991an) rûpel 286, Qahira 1992.

5 : Jêderê (1), rûpel 165

6 : Çapa Erebî ji pirtûka Qedri Cemil Paşa, ya bi navê Doza Kurdistan, rûpel 141, Beyrut 1987.

7 : Belec Şérko, hatiye naskirin ku Mir Celadet e, lê belê (konê reş) di pirtûka xwe de (nêzîk ev pirtûk dertê) îsbat dike bi rengekî zanistî ku Belec Şérko, Sureya Bedirxan e û ne Celadet e.

Wê dom bike

Ziya Gökalp û Tirkbûna Diyarbekir

Tirkbûna Ziya li ser gelê Kurd buha rûdinê. Ew ji bo ku Tirkbûna xwe îspat bike hemû bajarê Amedê dike Tirk. Ev Ameda ku di dilê gelê Kurd de wekî paytexta Kurdistanê cih standiye, Ziya bi yek derbekî dike Tirk û bajarê dîrokî yê Kurdan Amedê ji Tirkan re dike mal.

M. Merwanî

"Ew kesen ku li Diyarbekir cîwarbûyîne, ta ji Selçukiyan, İnaloglûyan û Artukoğluyan vir de Tirk in. Di pey de bi hatina Tirkên Harzem, Tirkmenen Akkoyunlu, Karakoyunlu Tirkbûna vira zêde bûye. Agahdariyên dîrokî, bi hezaran diwanen helbestvanan û kîtabetên (nivîsên) li sûran û mizgefstan nebin jî; zimanê bajêr, ehlaq û edetên bajêr wî nîşan didin ku Diyarbekir Tirk e. Çand (kultur) a vira, çanda heri dewlemend a Tirk e." (1)

Ev gotinê sosyologê Tirk (!) ên Ziya Gökalp in. Ziya Gökalp beriya ku Tirkbûna xwe bide îspatkîrin û xwe miroveki nîjadtirk (Türksoylu) nîşan bide, tevê bajarê-Diyarbekir dike Tirk û dihêle. Bi Ziya Gökalp e ku hemû Tirkên ku ji Asya Navîn hatine di Diyarbekir de cîwarbûyi nîşan bide. Ma ku tirkên Selçuki, İnaloğlu, Artukoğlu, Akkoyunlu, Karakoyunlu û Harzem tev di Diyarbekir de niştecih bûbin, kî

çû Enadol dagir kir û Enedol kir niştimana Tirkan. An ku Tirk di ku derê de bi mîvandarî ji derbas bibin, ew der dibe Tirk! Ji bo Ziya Gökalp agahdariyên dîrokî, pirtûk û nivîsên li ser, sûr û mizgeftan jî tu tiştekî ifade nakin. Lewra Diyarbekir Tirk e! Herçiqas li ser, sûr û mizgeftan navên bapîrên Kurdan hatibin nivîsin û ev sûn ji alî wan ve hatibin çekirin jî, dîsa Diyarbekir Tirk e. Li gora sosyologê Tirk ehlaq, edeb û zimanê bajêr jî, Tirkbûna Diyarbekirê nîşan dide.

Ziya Gökalp di berdewama vê nîvisa xwe ya jorîn de beyan dike, gava ku ew di xortaniya xwe de ji bo xwendinê çûye Stenbolê, dîtiye ku ji kesen Behra Reş re dibêjin Laz, ji yênu ku ji Surye û Iraqê têne re dibêjin Ereb, ji yê Rûmeliyê re dibêjin Arnavût û ji yênu ku ji wilayeti Şerqiye (Kurdistanê) têne re dibêjin Kurd. Ziya wiha didomine: "Heya wê gavê min xwe bi hîssi Tirk dihesiband. Lî ev ne bi metodeke ilmî bû. Ji bo ku ez rastiyê fîr bibim, ji alîki ve min li Tirkîtiyê û ji alîki ve ji min li Kurdiyê kola. Di

gel ku li bajarê Diyarbekir zimanê bingehîn tirkî ye, herkes hinek jî bi kurdî dizane. Ev dubendiya ziman bi du awayî dikare bê izahkirin: An Tirkîya Diyarbekir Tirkîyek Kurdan bû, an Kurdiya Diyarbekir Kurdiyek Tirkan bû. Lékolînên min ên li ser ziman nîşan dan ku Tirkîya Diyarbekir ji Bexdayê bigre heyâ Edînê, Bakû û Tebrizê pê tê axaftin, zimanek tabiiyê Akkoyunlu û Karakoyunluyan e û zaravê Ezerî ye.


Di zimanî de qet sûnitî tune" (2).

Ziyayê ku heyâ wê demê xwe bi hîssi Tirk dihesibine, di enama lêkolînên xwe yêne zanistî (!) de bi nîjadi jî, Tirkbûna xwe keş dike. Lî ci heyf e ku Tirkbûna Ziya li ser gelê Kurd buha rûdinê. Ew ji bo ku Tirkbûna xwe îspat bike hemû bajarê Amedê dike Tirk. Ev Ameda ku di dilê gelê Kurd de wekî paytexta Kurdistanê cih standiye, Ziya bi yek derbekî dike Tirk û bajarê dîrokî yê Kurdan Amedê (a, di kurdi de zayend û xwedîtiyê nîşan dide. Amed; ango a(ya) Medan. Yanê ew bajarê ku Med xwediye wî ne) ji Tirkan re dike mal. Heke Ziya Gökalp bigota "ez xwe Tirk hîss dikim", me dikaribû, ji vê dîtina wî re hurmet nîşan bida; lî mixabin ew bi navê "metoda ilmî û lêkolînê" ziman û rastiya neteweyekî inkar dike. Ev netewe, netewya wî bi xwe ye û ev ziman ji zimanê wî ye ku beriya gelek kesan ew bi Xellî Keyali re li ser ferheng û rîzimanana wî xebitbû.

Ziya Gökalp 70 sal berê dibêje ku (wî ev gotara xwe di 1922 an de nîvîsibû) li Diyarbekir zimanê bingehîn tirkî ye, lî herkes hinek jî bi kurdî dizane". Ma 70 sal berê li Diyarbekir 70 kesi bi tirkî (ez nabêjim bi Osmanî) dizanibû? Ziya Gökalp ramanen sosyolog Durkheim, dizî û ji "Tirkên ehmeq" re bû damazrenêre sosyolojiyê li Tirkîye. Bi ramana welatê Turan jî, ji nîjadperestiya Tirkî re bavîkir; lî inkarkirina rastiya netewya Kurd ew mezin nekir. Gelê Kurd xezeba xwe bi wî de dîbarîne. Li gora dîtina Ziya, Kurdiya Diyarbekir, Kurdiyek Tirkan e! Xuya ye ku Ziya Gökalp bavê peyvîn beredyî (saçma) yêne wekî Kurden Tirkan (Kürt Türkleri) e ji.

Çavkanî :

- 1- Ziya Gökalp Kürt aşiretleri hakkında sosyolojik tettikitler, r:122
- 2- Ziya Gökalp, bhd (Berhemâku navê wê derbas bû), r:12



Ziya Gökalp (1876 - 1924)

AZADÎ



Abdurrahman Durre

Gur kedî nabin

Türkeş û hevalen wî yêne tûranî, di her fersendî de dibêjin, ku Tirk çêjikên guran in, pêşiyen wan şîrê dîleguran vexwârine û dîlegurê ji wan re rîberî kiriye....

Bi rastî jî, ev gotinek pirr vala û bê hîm nîne. Tişten ku iro di Tirkîye de têne kîrin, ji bilî guran tu kes wan tiştan nakin. Çendek berê, polîs û tîman li Enqêrê dor li xaniyek girtin. Wezîrê, ku berpirsiyare mafê însanan e jî hatibû seyrê, li wan temâse dikir, di xanî de, çend keç û xorten şoreşger hebûn (televîzyonê jî nîşan da), ku bi sedan tîm û polîs, bi çek û sîlehîn modern, xanî bi serê wan de wêran kîrin, du keç û sê xortan, li ber çavê wezîr perçe perçe kîrin û di televîzyonê de jî, nîşanî dînyayê dan. Polîsek tîvinga xwe bilind kiribû, nîşana serfiraziyê dida. Wezîr beg û hînek faşîst û cenawerên din jî desten xwe jê re li hev didan û ala Tirkîye dihejandin. Te digot qey dînyayê fetih kîrine. Bi rastî jî ku min ev dîmena (menzera) cenawerî û hovîtî dît, min heq da Türkeş û Ülküdaşen wî, ku dibêjin "Tirk ji guran hatine." Bi baweriya min, gur jî çêjikên xwe wilo bi xwînxwarî nakujin, belkî berxikan diku-jin, lê..... tişte pîrr ecêb û sosret ev bû ku wezîr efendiyê ku temâsa wan di-kir, destê xwe ji wan re li hev dida, we-zîrê mafê însanan bû, yanê mafê însanan di Tirkîye de wi-ha ye (bravo, sed e-fîrin, bijî Demirel, hîkûmeta Demirel û wezîren wî, çîqas însan û demokrat in! Maşela û sed maşela).

Xwendevanên eziz!

Ku tiştek wiha li welatek demokratik, mesela li welatek Ewrûpa bîbûya, dê hîkûmet derhal biketa û ew wezîr, tîm û fermandarên wan jî, dê derketana dadgehê (mehkemê). Eger li Ewrûpa tiştek wilo çêbibûna, dê polîsan dor li xêni bigirtana, ava wî elektrîka wî bibirîna, bi rojan, bi heftan li hîviyê bîmana, heta ku ew bi saxî bigirtana û teslîmî dadgehê bikirana, ger xetayê wan hebûna, wê cezayê xwe bikişandana. Demokrasî û însaneñî ev e û wiha ye, gurîtî û hovîtî jî, ev e ku me ji we re bi kurîfî ïzah kîr. Belkî we jî di televîzyonê de wê dîmena hovîtiyê temâse kiribe.

Ji ber vê, em dibêjin ku, ji Demirel û hîkûmeta wî, demokrasî nayê hîvîkirin. Divê ku mirov vê rastiyê rind bizanibe, li gora wî bifikire û li çara wî bigere. Gur hertim gur in.

Demirel digot: Ez Kurdan nas dikim, ezê hemû mafê wan ên însanî û demokratikî bidim wan, dê politika min zelal be, dê her tiş li ber çavan be, ezê erzanî, xweşî û geşiyê bînim welat...û hwd." Gedê paşê jî (Erdal) jê re dêla xwe hejand, desten xwe li hev da û wek "Pembe Panter" li dû wî direqisî. Ev bû salek ku li ser kar in, gelo ci kîrin? Kurdistanê kîrin gola xwînê û Kurdan wilo nas kîrin. Di Newrozê de, bi sedan jin û zarok kuştin, bi hezaran însan di zîndanan de perişan kîrin, bi sedan keç û xorten Kurd û gundiyen bêxeber kuştin, hê nû li Şîrnexê kevir li ser kevir nehiştin û birek însan kuştin, bi hîzbî şeytan, MiT û tîmîn xwe ketin nav Kurdan, bi hezaran panok (cerdevan, korucu) û caşik çêkirine, rewşenbîr, nîvîskar û rîzânîn Kurdan ên bi şeref û namûs, bi qelaşî û xayîntî dikujin û niha jî ev politîkaya bi qirêj û gemar didominin. Ji ber van politîkayê çewt û faşîst, bi hezaran esker, polîs û serbaz (subay) jî hîtin kuştin. Bi kurtayî welat bi saya wan bûye gola xwînê. Demokrasî û erzaniya hîkûmeta Demirel wiha ye, dê wiha be jî. Belê bi rastî jî gelek tiş erzan kîrin. Vir û derewan, xwîna însanan, cerd û talan, îşkence, zîlm û tadayî erzan kîrine. Pere jî erzan kîrine, di çavê dinê de Tirkîyeyê jî erzan kîrine. Zirt û fort, dek û dolaban jî erzan kîrine. Xwe jî erzan kîrine, dê hîji erzan bibin. Ma qey evqas erzanî ne bes e? Emrê wan dirêj be, şopa wan qirêj be, gedê paşê jî pîrrir kerr û gêj be. Gotineke pêşîyan e, dibêjin: "Gur kedî nabin, kerî bê xwedî nabin, bê ar jî, bi fedî nabin."

Vegerîna çivîkek

Hemû çivîkan piştî ku çikildanê xwe tijî genim kirin bo hêlinê xwe vegerîyan.

Ji nişkê ve bagerêk hel kir, ewrên sipî reş hilgeriyan, bager jî çivîkek xiste xwarê û hemû per û pûrtêwî helwendî.

Çivîka belengaz kete nav hinek dar û dirextan, perek çîye bi sing û balêwî neman..

Hinek balindan goştxwar li dora wî civîyan, pîçek mabû

çivîk bidina ber nikiyan. Çivîk jî bi balêwî, li vir û li wir, li wî digeriyan...

Balindeke goştxwar dixwest bi nikilê xwe li vî bixe, lê hevalêwî gihîstîn ser wî û ew rizgar kirin... Wan dîtin ku çivîk li bin darek bi tenê li ber xwe dide... Hemû çûn cem çivîka rût, paşê jî dan pey baldîna goştxwar..

Vêca her yek ji wan perek ji xwe ve-kirin û di sing û balêwî çivîka rût de çikilan-din.



Li dawî de çivîka delal jî, bi hevalêwî xwe re bi hewa ket û firiya.....

Ênane ser şêwa Kirmancî: Mehabad Kurdi

Çavkanî:

Pertûka "Minal û Baran" Letîf Helmet kiriye kurdi.



'PIŞEKEM'

Piše pişey rengîn im
Zor pêm xoşe bitbîn im
Dest be piştit dabênim
Simêlit biculênim
Ciwan û rind tûk nermî
Zor be heyâ û be şermî
Ti bo min bilê miyan miyan
Min bot dênim nan û aw

Çavkanî
Pepûle, Swêd 1987

Kew û rûvî

Rûviyekî birçî li çolê ji xwe re digere. Ew rastî kewek hat. Kew ageh lê ne bû... Wî ji xwe re got.

Rûvî: Ê ku xewa wî neyê, çawa bi derewan kare binive (raze)? Ez dê seh kim û xwe biceribînim.

Kewê çavên xwe girtin û xwe nivand. Rûvî jî rabû û rahişte kewê. Kewê nêri ku ew di devê rûvî de ye û got.

Kew: Mam (ap) rûvî, te ez girtim û va ye behra te bûme. De spasiya xudê bike!

Rûvî: Spas ji Xwedê re!

Gava ku rûvî spasiya Xwedê kir, devê wî vebû û kew jî xwe rizgar (xilas) kir û firî. Rûvî jî, xwelî bi serê xwe kir û hawar kir.

Rûvî: Xwelî bi serê wî kesê birçî ku spasiya Xwedê dike.

Kew, ji wî re got.

Kew: Xwelî bi serê wî kesê ku xewa wî nayê û bi derewan binve!

Beşîr Botanî



Roj baş zarokno! Roj baş ciwanino!

(2)

Wek min soz da, va ye ez car din bi we re me. Werin em îro li ser saldem (mewsîm) rawestin. Di salekê de çend saldem hene? Hûn dizanî? Helbet hûn dizanî. Di salekê de çar (4) saldem hene:

* Bihar * Havîn * Payîz * Zivistan

Saldem hemû xweş in, lê bihar bûka saldem e. Li Kurdistanê bihar di meha adarê de dest pê dike. Ro germ dibe, berf dihele, dinya kesk dibe, kuşlîkên rengîn dertê, çemelê (gulliyê) daran tijî pel û kuşlîk dibin. Di mehîn biharê de mîh û bizin dizanî. Firo, rûnê nivîşk, mast, û dew û penêr pîr dibin.

Li dû sê mehîn biharê havîn tê. Havîn bi meha hezîranê dest pê dike. Dinya germ dibe. Li dû paleya ceh, xelk dest bi paleya genim dikin. E pemî (pembû) diçînîn, pemiyê xwe av didin. Havîn saldema kar û xebatê ye; helbete ji bo kesen rîncber, ji bo kesen cotkar, ji bo gundiyan. Kesen xweşî pere di mehîn havînê de dê derdi Kevin tatîlê, diçin gerê, diçin ser avê, ji xwe re kîf dikin.

Lê ciwanino, tu car ji bîra mekin! Pere çiqas ji-yana (heyatê) mirov hêsan bikin jî, pere nikarin ji mirov re bextiyariyê (dilşadiyê, seadetê) bikirrin. Bi hezaran kesen milyoner li cîhanê (dunê) hene, ku pereyên wan li serên wan bûne bela. Bextiyarî û kîfxweşî bi pereyan nayên kîrîn. Bextiyarî ji hezkîrinê tê, ji hevaltiyê, ji xwîşkî û biratiyê, ji qenaetê, ji rîndiyê. Kesen dilreş û ezo tu caran bextiyar û dilşa nabin.

Li du sê mehîn havînê payîz tê. Payîz bi meha îilonê, meha nehem (9em) di salê de, dest pê dike. Tîrî pîr dibe, xelk pemiyê xwe berhev dike. Gundî xaniyê xwe siwax dikin, qûtê (zexîre) xwe ji bo mehîn zivistanê amade (hazîr) dikin. Ji bo Kurdan, payîz demsala zewacê ye. Xort û keçen ciwan dizewicin, bi dahol û zurne, bi stran û dîlan, bi xweşî û rîndî.

Li dû payîzê zivistan tê Zivistan saldema serma û pûkê ye. Di salêni bi xêr de baran pîr dibe û hêdî hêdî berf dest pê dike bibare. Hin salan berf ewqas pîr dibare, ku li Kurdistanê rê û rîçik têyêñ birfin. Di rojêñ zivistanê de şev dirêj dibin, roj kurt (kin) dibin. Li gundan xelk di odayen de dicivin (kom dibin), çîrokan ji hev re dibêjin, stranîn dibêjin. Hûn dizanî?! Gelê Kurd bi sedan sal çîrok û stranîn xwe bi dev ji nîşekî (refekî, cîlekî) derbasî nîşekî din kirine.

Stranîn me, yên wek Siyabend û Xecê û Dewrêşê Ebdî, ji bapîren me gihîstîne me û hê jî îro di odayen gundan de têyêñ gotin. Xelk ji wan pîr hez dike. Stranîn wisa (wanî) û serpêhatiyêñ (çîrokêñ) wek Mem û Zinê, ji edebiyata (wêje) me ya klasik in. Heta Kurd hebin, ew ê jî hebin; heta ew hebin, Kurd jî dê hebin.

Zarokno! Ciwanino! Edebiyata me pîr dewle-mend e (zengîn e). Lê bigerin, lê xweşî derkevin. Sal bêyî saldem nabin. Gel jî bêyî edebiyat û çandê (kultur) nabin. Ta cara tê, saldemên salê ji ber bikin (ezbere): Bihar, havîn, payîz, zivistan. De di xweşî û rîndiyê de bimînin.

Şahînê B. Soreklî

**PROVOKASYONA
ŞIRNEXÊ**

Îro, çapemenî ne li pey derxistin û dazanîna rastiyê ye. Ew, bi zanebûn an ji nezanebûn, rastiyê ve dişere. Li Şirnexê, baş eşkere ye ku dewleta Tirk provayek (ceribandineke) qetliamê pêk aniye. Pêwest nake mirov bêje ev qetliam perçeya kîjan planen giştî ye. Demekê, serokê Artêşa Tirk digot: "Gerîna awarte ne bes e, Rêvebirina Taybeti ji ne bes e, pêwesti bi hinek metodên din heye. Li dîroka me binêrin, hûnê fam bikin ez ci dibêjim." Ger em van gotinê serokê Artêşa Tirk bînin bîra xwe, emê pê derxin dewleta Tirk ci, bi ci awayî dixwaze bike.

Hêzên PKK'ê yên gerîla ne ketine Şirnexê. Ne grûbekê mezin, ne ji bicûk gerîla ne girtine ser Şirnexê.

Ger em ketibûna nav Şirnexê, dê me ilan bikira. Helwesta me ya heta niha, herkes dizane, bi vî awayî ye. Yanî, dema em tiştek dîkin, em ilan dîkin û digrin ser xwe. Heta îro bi tu awayî me lebaten xwe veneshartine. Ger weşanên PKK'ê yên çapemeniyê baş bêñ xwendin û kolîn, wê bêzanîn ku em her tişti, hem bûyerên ji bo me, hem ji yên li dijî me, bi awayekî hevgirtî diyar dîkin.

Dewlet dizane ku di pêşerojê de emê bigrin ser bajaran û wan bixin destê xwe. Ji ber vê yekê bêyi ku em bajaran bixin dest, dewlet dixwaze bêyi me bigre ser bajaran û planen me provoke bike yanî, dixwaze bi provokasyonên wek Şirnex, rî li me bigre.

**LİSTIK Ü
DEREWÊN WAN**

Bûyera Şirnexê, bi ihtîmaleke mezin, senaryoyeke dewletê bû. Di nav dewletê de, ez bawer im ku hêzên cure cure hene. Dibe ku di nav xwe de li hev ne kiribin hinek ji wan ev qetliama Şirnex provoke kiribe. Ez nabêjim ev qetliam bi destûra Özal hatiye pêk anîn, lê ez dibêjim ihtîmal e ku ji jor ve hatibe plan kirin.

Ocalan dibêje

Sekreterê giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, ji bo provokasyon û qetliama Şirnexê wiha dibêje: "Li hember van qetliaman û di pêvajoya qetliaman de, bi hêza gelê xwe, bi taqîkîn têkoşînê yên hevgirtî û bi qaîdên cengê yên rast emê bersiv bidin. Em tu qetliamî, bê bersiv nahêlin."

Piştî vê qetliamê Özal a-xaftineke "balkêş pêşkêş kir. Çawa ku haya wî ji hinek tiştan hebe, ji guftûgoyekê haydar be û li gora wê ji behsa çareserkirina vê pirse kir.

Li aliyê din, ev demeke, dewlet dibêje ku dê derbêñ mezin li PKK'ê were xistin. Li hember pêşveçûnên girseyî yên 15'ê Tebaxê û lebaten gerîla, dewlet xwest senaryoya qetliamekê li dar bixe.

Li Şirnexê yek gerîlayek tenê ne sax ne ji mirî, ne ketiye destê wan, kesen hattine girtin, tev zarok, jin û pîrên Şirnexê ne. Dibêjin ku 500 kesan girtine, lê yek ji wan tenê ji ne gerîlaye û eleqeya wan bi gerîla re nin e. Li kuçan (sikakan) gelek sewal (heywan) ji hattine kuştin. Dibêjin PKK'ê girtiye ser sazgehêñ dewletê. Ev ji derew e. PKK ne girtiye ser sazgehêñ wan ji. Ev idia ji, diyar dike ku bi ihtîmaleke mezin bûyera Şirnexê provokasyoneke dorfireh û plankirî ye. Ger hûn dixwazin rastiya vê bûyêrên baş hîn bibin, lêkolîn û lêgerînen xwe kûr û dorfireh bikin.

Behsa stargehêñ binerdê kirin, lê yek stargehek ji dernekete meydanê. Wezîrê Karê Hundir got "100 gerîlayen PKK'ê di vê bûyêrê de hatine kuştin, lê cenazên xwe revandine." Ev gotin ji giş yekcar derew in. Yanî qetliamek ji hêla dewleta Tirk ve hatiye kirin û pêwest e bi girîngî li ser bê rawestin. Haya me ji hemû komên gerîlayen me heye û imkan tune ku komeke gerîla bêyi zanîna me ketibe Şirnexê. Ev qetliameke

yevalî bû.

QAÎDÊN ME Û WAN

Qaîdên me, yên durust in, ji hêla gelê me ve hatine ecibandin. Xwezî dikaribûna bi qaîdên PKK'ê têkoşîn bikirana.

Wezîrê Karê Hundir bi xwe da nav hewldana pêkanîna metodên Kontrgerîla de ye. Qaîdên ku ew pêk tîne qetliama Şirnexê tîne bîra mirov. Esas, İsmet Sezgin bi van gotinê xwe dixwaze bêje: "Ez ji vê qetliama Şirnexê ne bê xebîr im."

HÊZA ÇAKÛÇ Û ŞIRNEX

Bi maneyeke giştî, mirov dikare bêje heye. Ji ber ku li gor agahdariyêñ digijîne me, hikûmeta Tirk, Berzanî Telabanî û Hêza Çakûç (Çekiç Güç) ji bo êrîşbirina ser PKK'ê, planan çedîkin.

Ji cephâ Kurdistanê hinek agahdarî gihîştin destê me. Li gor van a-gahdariyan, cephâ Kurdistanê bi xwe ji dixwaze êrîşî ser PKK'ê bike. Heta, ji ber vê yekê dubendî kete nav cephâ Kurdistanê. Hinek hêzên cephâ Kurdistanê, li ber vê plana wan radibin. Lê biryara vê planê hatiye standjin. Li gor dîtina min, bûyera Şirnexê, perçeyek ji vê planê ye.

Pêşî dixwestin ji milê Başûr ve bigrin ser me, bes dîtin ku hêza me li wir xurt e û di êrîşê de wê bi ser nekevin, dev jê berdan. Li derdora Şirnexê, li çiçayen Cudi û Gabar ji dîtin ku, gerîla pîr xurt in û bi

Van gotinan, ne ji bo çare-serkirina pîrse dîkin, ji bo kêmasyen xwe yên ideolojîk kêm bikin, ev axaftinê balkêş tê kirin.


Li hember van qetliaman, divê ne sersar bin. Kesêñ wek heştîrme (devekuşu) yan ku serê xwe dixin qûmê nikarin ji xwe re bêjin rewşenbîr û demokrat. Li hember tunekirina gelekî divê bedeng neyên rawestin. Qet nebe, divê rastiyê bînîn ziman, reaksiyona xwe ya rewşenbîr diyar bikin.

Li hember van qetliaman û di pêvajoya qetliaman de, bi hêza gelê xwe, bi taqîkîn têkoşînê yên hevgirtî û bi qaîdên cengê yên rast emê bersiv bidin. Em tu qetliamî, bê bersiv nahêlin.

DAWETKIRINA HEP'Ê

Maneya vê vexwendinê eşkere ye. Amerika, bi navgîna hinek hêzên sivîl, dixwaze çalakiyên (faaliyetên) xwe zêde bike. Bi taybetî, dixwaze partîyeke Kurd a dûvelank (uydu) ji xwe re çêbike. Nêzîkahîya ku li HEP'ê dike ji, dibe ku bi wê armancê be. Dixwaze

HEP'ê pêşî bicerbîne û ji bo armanca xwe bi kar bîne.



- Li ser navê IMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır
- Berpirsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyare Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnışan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 511 57 60 - 511 66 02
- Fax: 511 51 57 • Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rue G-401 92763 Antony Cedex France
- Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ